

Kurdistan Region - Iraq  
Ministry of Higher Education  
and Scientific Research  
University of Zakho



*ISSN: 2410-7557*

*Journal of*

# **University of Zakho**

*B - Humanities*

**Volume 4**  
**Number 1**

**June**  
**2016**

***Journal of University of Zakho***

***B - Humanities***

**Volume 4  
Number 1**

**June  
2016**

## Contents

- LI GOR ÇÊBÛNA XWE BÊJEYÊN KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ)**  
Mehmet Tayfun (Malmîsanij) and Abdulwahab Xalid Mosa .....1
- Tesîra Modernîzmê LI SER Xebatên Pêşî Yên FOLKLORA Kurdî Tirkî**  
Ramazan Pertev ..... 12

## LI GOR ÇÊBÛNA XWE BÊJEYÊN KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ)

Mehmet Tayfun (Malmîsanij)<sup>1</sup> & Abdulwahab Xalid Mosa<sup>2</sup>

<sup>1</sup>Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê, Turkey.

<sup>2</sup>Zanîngeha Zaxoyê

(Accepted for publication: May 4, 2014)

### Kurtîya lêkolînê:

Ev lêkolîna bi navûnîşanên (LI GOR ÇÊBÛNA XWE BÊJEYÊN KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ)) ye, li pey rêbaza wesfî şirovekarî hatîye encamdanê û kerstê wê ji herdu dîyalêktên Kurmacî û Kirmanckîyên zimanê Kurdî hatîye wergrtinê, ew jî bi bi herdu rêkên:

1- Wergirtin ji zardevê xelkî.

2- Wergirtin ji nimûneyên nivêsandî.

Armanca giştî ji vê lêkolînê ewe ku alîyekê berawirdîyê di navbera du dîyalêktên serekîyên zimanê Kurdîda berçav bikeyn, alîyê taybetî jî ewe ku ronahîyê bideyne ser taybetmendîya diyarda çêbûna bêjeyên kirmanckî ji rûyê pêkhatnêve û ji alîyê dinve layenên hebeşî û cudahîya pêkhatina bêjeyan di navbera Kirmanckî û Kurmancîyêda diyar bikeyn. Li dawyê jî li gor çarçûvê bo lêkolînê hatîye danan çend encamên diyarkirî bi destve hatîne.

*Kilîla lêkolînê: Pêkhatiya bêjeyan, Kirmanckî, Kurmancî.*

### Ferhengok:

Kurdî	kurdî
bêje	peyv, wişe.
bêjeyên xwerû	peyvya sade, wişey sade.
bêjeyên darştî	peyvya darjaw, wişey darjaw.
bêjeyên hevduanî	peyvya lêkday, wişey lêkdiraw.
dîyalêkta kirmanckî	dîyalêkta zazakî, dîyalêktî zazakî.
dîyalêkta kurmancî	dîyalêkta kirmancîya jûrî, dîyalêktî kirmancî jûrû.
çavkanî	serçawe.

### Pêkhatiya lêkolînê:

1. Destpêk.
2. Bêjeyên kirmanckî ji layê pêkhatnêve:
  - A. Bêjeyên xwerû.
  - B. Bêjeyên dariştî.
  - C. Bêjeyên hevduanî.
3. Hevbeşî û cudahîya bêjeyên kirmanckî û kurmancî.
4. Encam.
5. Perawêz.
6. Çavkanî.
7. Kurtîya lêkolînê bi zimanê Ingilîzî.

### 1. Destpêk:

Di vê lêkolînê de, dê ronahîyê deyne ser cure û çêbûna bêjeyên dîyalekta kirmanckî (zazakî) (1). Lewra di destpêkê de, dê bi awayekî gelek kurt li ser kirmancan (zazayan) û dîyalekta wan hin agahdarîyan xweyakeyn (2).

Heke em yên li derveyî Kurdistanê nehesibînin, kurdên ku dîyalekta kirmanckî diaxivin, îro di nava sînooren van wîlayetan de dijîn:

1. Çewlîg (Bingöl)
2. Dêrsim (Tunceli)

3. Dîyarbekir (Diyarbakır)
4. Xarpêt (Elazığ)
5. Erzingan (Erzincan)
6. Ruha (Urfa)
7. Mûş (Muş)
8. Semsûr (Adıyaman)
9. Bidlîs (Bitlis)
10. Sêwas (Sivas)
11. Erzirom (Erzurum)
12. Sêrt (Siirt)

Ji van wîlayetan, li Dêrsim û Çewlîgê pîranîya xelkî; li Dîyarbekir, Xarpêt û Erzinganê beşekî girîng yê xelkî bi vê dîyalektê diaxivin. Em dişên bêjin ku li hin wîlayetan, tenê li qezayekê ev dîyalekt tê axaftin. Wekî qezaya Sêwregê (Siverek) ya wîlayeta Ruhayê, Gimgima (Varto) Mûşê, Alduşa (Gerger) Semsûrê, Modana (Mutki) Bidlîsê. Li wîlayetên Sêwas, Erzirom û Sêrtê hejmara axêverên kirmanckî hindik e. Li gor ku ji hin belgeyên fermî yên Komara Tirkîyeyê tê fêmkirin, li wîlayetên Meletî (Malatya), Qers (Kars), Gümüşhane û Seyhanê [Adana] jî hejmareka kêma ya kurdên kirmanckîaxêv heye (3).

Kurdên kirmancîaxêv, li Dêrsimê ji xwe re dibêjin **kirmanc**; li Çewlîgê, hin qezayên Xarpêtê û Dîyarbekirê ji xwe re dibêjin **kird**; li herêma Sêwregê ji xwe re dibêjin **dimlî/dimilî**. Bêjeya **zaza**, hîn zêde tirkan ji bo kirmanckîaxêvan bi kar dianî. Herweha kirmancên bajaran jî li hin deran ji xwe re digotin "zaza" lê ev bêje ji alî kirmanckîaxêvan kêma dihat bikaranîn. Her ku bandora tirkî li ser kirmanckîaxêvan zêde bû, bêjeya zaza zêdetir hat bi kar anîn. Herweha çend zimannasên

ewropî û amerîkî yên ku li ser kirmancî xebitîne jî, di bin tesîra tirkî de mane û di lîteratura wan de jî bêjeya zaza tê bi kar anîn. Navên "dimilî" û "zaza" di eslê xwe de navên eşîran bûn ku paşê teşmîlê kirmancîaxêvan bûne (4). Bi a min, ji ber ku piraniya kirmancîaxêvan ji xwe re dibêjin **kirmanc** yan jî **kird** û ji dîyalekta xwe re dibêjin **kirmanckî** yan jî **kirdkî**, rasttir e ku meriv van bêjeyan bi kar bîne. Grûba Xebate ya Vateyî ya ku ev bîst sal e li ser kirmancî kar dike, ji van navan **kirmanc** û **kirmanckî** tercîh kirine, em jî van bêjeyan bi kar tînin.

Tiştêkî balkêş e ku li her çar parçeyên Kurdistanê, hin kurdên ku bi dîyalektên cuda-cuda yên kurdî diaxivin, ji xwe re dibêjin "kirmanc" û ji dîyalekta xwe re dibêjin "kirmancî" (5).

Herçiqas mijara me ne ev be jî, divê ez qala wateyeka din ya bêjeya "kirmanc"ê jî bikim. Li hin deverên Kurdistanê, ji kesên ku bi eslê xwe mensûbê eşîrê nebin re dibêjin "kirmanc". Herweha li hin deveran, ji cotkar, re'ye û gundîyan re jî dibêjin "kirmanc". Bo nimûne, li devera Behdînanê gotina "Ez ne kirmancê babê te me", yan jî di dîwana Melayê Cizîrî de gotinên "mîr û kurmanc" (6) nişanên vê wateyê ne (7).

## 2. Bêjeyên kirmancî ji layê pêkhatnêve:

Niha em bîst ser mijara bêjeyên kirmancî (zazakî).

Li gor çêbûna xwe, bêje sê cure ne: Bêjeyên xwerû, dariştî û hevedudanî.

### B.1. Çend pêşgir û bêjeyên ku bi wan hatine çêkirin

Kirmanckî (Zazakî)	Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî	Kurmancî
pêşgir	bêje	pêşgir	bêje
a- I	1.abînşo/abîşo/abîşû [a + bîn+şew] 2.abtîşo/abîşû [a + bîn + tir + şew]	-	1.dîşev (9) [din + şev], şeva din 2.pêr şev
a- II	1.acêr/acîr 2.acor 3.apey 4.aver/over/ûver	-	1.ber bi jêr 2.ber bi jor 3.paş da/paş de, pey 4.[ew ber], ber bi pêş, pêş de
ber-	1.berbanik 2.berpa/berpî	ber-	1.bervank 2.berpê
bê- / bîye-	1.bêaqil 2.bêbext 3.bêsol/bêusual/bêsuêl 4.bêveng	bê-	1.bêaqil 2.bêbext 3.bêxwê 4.bêdeng
bi-	1.biaqil / b'aqil 2.bikeyf/bikêf	bi-	1.biaqil / b'aqil 2.bikêf
bî- / bîn-	1.bîro [bîn + roj] / bêro/bîyor 2.bîntirro [bîn + tir + roj] / bînterro	-	1.roja din / roja dî [din + roj] 2.sêsibe [din + tir + roj]

Bêjeyên kirmancî yên ku di vê gotarê de wekî nimûne hatine nivîsîn, ne bêjeyên nûçêkirî/nûdariştî yên çil salên dawîn in. Anko di lêkolînêde bêjeyên ku di kirmancîya gelî de hene, weke nimûne hatîne bikarhînan.

### A. Bêjeyên xwerû:

Bêjeyên xwerû, ev bêje bi awayekî serbixwe erka xwe di ferhenga bingehîna zimanî de xwya dibin û ji aliyê pêkhatinêve pêşgir, paşgir û navgiran rola xwe di avakirina wan de nabînin. Çend nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî
birra	birra
çim	çav
kes	kes
por	por
şima/sima	hûn
ver	ber/wer (8)
zerd	zer

### B. Bêjeyên dariştî:

Bêjeyên dariştî, ew bêje ne ku pêşgir, paşgir yan jî navgir wergirtine. Di **kirmanckî** de bêjeyek, dikare pêşgir, paşgir yan jî navgirê werbigire. Di kirmancî de gelek bêje bi guherîna dengên li gor herêman tên guhertin. Herweha hin pêşgir û paşgir jî li gor herêman diguherin. Li jêrê dê beşek ji pêşgir û paşgiran li gel nimûneyên wan dîyarkeyn. Di navbeyna varyantên cihê-cihê yên pêşgir, paşgir û bêjeyan de xêzeka xwar (/) hatiye danîn.

	3. <b>bînşew</b> [bîn +şew]/ <b>bînsewe/</b> <b>bînso/ bîşew/bînşewka / bîşewka</b>		3. <b>dîşev</b> [din + şev], şeva din
	4. <b>bîntirşewe</b> [bîn + tir + şew] / <b>bînterşew/bînteso</b>		4. <b>şeva bertir/şeva betir</b> [din + tir + şev]
<b>da-</b>	1. <b>dades</b> 2. <b>dapancês</b> 3. <b>davîst</b>	-	1. <b>nêzîkî</b> deh 2. <b>nêzîkî</b> panzdeh 3. <b>nêzîkî</b> bîst
<b>der-</b>	<b>derheqê / derheqa</b> <b>dermal, dermalî</b> <b>derhal</b>	<b>der-</b>	<b>derheqê / derheqa</b> <b>dermal, dermalî</b> <b>derhal</b>
<b>em-</b>	1. <b>emşo</b> [emşew]/emso/eşmo 2. <b>emsar/emsar/esmer</b>	<b>î- / ev-,</b> <b>em- (KN)</b>	1. <b>îşev, evşev/emşew/îmşew</b> (KN) 2. <b>îsal/evsal, emsal</b> (KN)
<b>ew-/ey-/ê- /î-</b>	<b>ewro/eyro/êro/îro</b>	<b>ev- / î-</b>	<b>evro/îro/îrû, emro/îmro/ewro</b> (KN)
<b>hem-/am- / om- / an- / em-/im- /on-</b>	<b>hemver/amver/omver /anver</b>	<b>hem-</b>	<b>hember</b>
<b>hem-</b>	<b>hembaz/embaz/ambaz /</b> <b>imbaz/ombaz/onbaz</b>	<b>hem-</b>	<b>1.heval 2.enbaz (10)</b>
<b>im-</b>	1. <b>imşo</b> [emşew]/işmo 2. <b>imsar/imsar/ismer</b>	<b>î-, em-</b> <b>(KN)</b>	1. <b>îşev, emşew/îmşew</b> (KN) 2. <b>îsal, îmsal/emsal</b> (KN)
<b>î-/wi-/wey-</b>	<b>îta/wîta/weyta</b>	-	<b>ev der, vir</b>
<b>ne-</b>	1. <b>neheq</b> 2. <b>nekes</b> 3. <b>nesax</b> 4. <b>nezan</b>	<b>ne-</b>	1. <b>neheq</b> 2. <b>nekes</b> 3. <b>nesax</b> 4. <b>nezan</b>
<b>nê-/ni- / nîye-</b>	1. <b>nêweş/nîweş/ş/nîyeweş</b> 2. <b>nêwende/nêwendî</b>	<b>ne-</b>	1. <b>nexweş</b> 2. <b>nexwende/nexwend</b>
<b>pe-</b>	1. <b>peroj/peroz</b> 2. <b>peşewe/peşewe</b>	<b>bi-</b>	1. <b>biroj</b> 2. <b>bîşev</b>
<b>pê- / pa-</b>	<b>pêwer /pawer</b>	<b>pê-</b>	<b>pêxwarin, pêxor</b> (KN)
<b>ra-</b>	<b>raver/ravey/ravêr/ravê</b>	-	<b>berê, pêş</b>
<b>u-/ew-/wi-</b>	<b>uca/ewca/wîca/weyca/awca/awja/awza</b> <b>/uza</b>	-	<b>ew cî, [li] wî cî, ew der, wir</b>
<b>ver-</b>	<b>verbendik</b>	<b>ber-</b>	<b>bervank</b>

## B.2. Çend paşgir û bêjeyên ku bi wan hatine çêkirin

Di kîrmanckî de hejmara paşgiran ji ya pêşgiran pirtir e. li vir ji wan tenê dê çend nimûneyan berçavkeyn (11).

<b>Kîrmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kîrmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmanckî</b>	<b>Kurmanckî</b>
paşgir	bêje	paşgir	bêje
<b>-a</b>	1. <b>desta</b> 2. <b>zura / zûra</b>	<b>-e</b> <b>-ker</b>	1. <b>deste</b> 2. <b>derewker</b>
<b>-al / -ale</b>	1. <b>çengal/çungal</b> 2. <b>gopale</b> 3. <b>kendal</b>	<b>-al</b>	1. <b>çengal/çingal</b> 2. <b>gopal</b> 3. <b>kendal</b>
<b>-e</b>	<b>deste</b>	<b>-e</b>	<b>deste</b>
<b>-ker</b>	1. <b>zîvker</b> 2. <b>zurker</b> 3. <b>fendker/feniker</b> 4. <b>mîziker</b>	<b>-ker</b> <b>-ek/-ok/-oke</b>	1. <b>zîvker</b> 2. <b>derewker</b> 3. <b>fendek/fendok/fenok/fenek</b> 4. <b>mîzoke / mîzek</b>
<b>-i/ -e</b>	1. <b>çimi / çime</b>	<b>-î/-e/-a</b>	1. <b>çavî</b>

(jibo nêr)	2.kewtî / kewte 3.nuştî / nuşte 4.vîcnayî/vîjnaye/weçînite 5.wendî / wende		2.kevtî/kefî/kefî 3.nivîsandî 4.bijarte / bijartî 5.xwendî/xwende
<b>-ik</b>	1.lepik / lopik 2.zerdik	<b>-ik</b>	1.lepik 2.zerik/zerdik
<b>-î / -îye / -a</b> (jibo mê)	1.kewtî / kewtîye / kewta 2.nuştî / nuştîye / nušta 3.vîcnayî/vîjnayîye/vîjnaya/ weçînitîye 4.wendî / wendîye / wenda	<b>-î / -a / -e</b>	1.kevtî/kefî/kefî 2.nivîsandî 3.bijarte / bijartî 4.xwendî/xwende/xwenda
<b>-kî</b>	1.kurdkî 2.fariskî 3.armenîkî	<b>-î / -kî</b>	1.kurdî 2.farisî 3.ermenî/ermenîkî/ermenîkî/ rmenîkî/êrmenkî

### B.3. Çend navgir û bêjeyên ku bi wan hatine çêkirin

Di kirmanckî de, navgirên "-a-", "-e-", "-o-" hene.

Nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)		Kurmançî	
-a-	nêmanê/nîmanîm raştarast	-e-	Nîvenîv /nîvanîv rasterast
-e-	-e- rasterast/raşterast	-e-	rasterast
-o-	-o- nîmonîm	-o-	nîvonîvo

### C. Bêjeyên hevedudanî:

Bêjeyên hevedudanî, ev bêje ne ku ji çend bêjeyan pêk hatine û wateyeka yan jî çend wateyên nû wergirtine.

Di kirmanckî de, bêjeyên hevedudanî bi çend awayên cuda çêbûne, li jêrî dê bas ê wan cudahîyan hêtekin ê.

#### C.1. Bêjeyên hevedudanî yê ku li gor rêzbûna bêjeyan ya îzafeyê hatine çêkirin

Îzafeyên sade ji du bêjeyan pêk tên. Bo nimûne, em li ser îzafeya "rîyê pelî" (KU. rûyê pelî) bifikirin. Di vê îzafeyê de, "rî" (KU. "rû") bêjeya yekem, "pel" bêjeya duyem e. Di bêjeya hevedudanî ya "rîpel" (KU. "rûpel")î de, ev her du bêje li gor rêza îzafeyê hatine ba hev (KI. "rî + pel", KU. "rû + pel") û bêjeyeka nû pêk anîne. Ango di vê bêjeya hevedudanî de, wekî rêza bêjeyên îzafeyê, "rî" (KU. "rû") bêjeya yekem, "pel" bêjeya duyem e û ji her duyan bêjeyeka nû hatîye çêkirin.

Hin nimûneyên din:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmançî
bapîr	bapîr
binboçe	binboç
binçeng	binçeng
bindest	bindest
binerd/binherd	binerd
binffistan	binkiras
binpîze [bendê pîzeyî]	navteng
fekakerde	devvekîrî
fekçarox	devçarox
fekgilêz / fekgilêj	devgilêz
fekmalêz	devgilêz
fekşorik	devşorik

fekvila/fekwela	<b>bawîşk</b>
fekweş	<b>devxweş</b>
gîmerre/gimerre/cîmerre	<b>gûmişk</b>
<b>keyxeripîyaye/keyxeripîyaye/keyxerepîyaye</b>	malxerab/malxirab
kênapî	<b>keçap</b>
<b>mîyanşewe</b>	nîveşev
nêmşewe/nêmesewe/şewenême	nîveşev
ocaxkor/wecaxkor/wicaxkuar	ocaxkor
paşêne	paşînî
peygoş	<b>piştguh</b>
porkej	porkej
porsûr/porsur	porsor
rîpel/ripel/riper	rûpel/rûper
rîsipênî/rispênî	rûspîtî
serbar	serbar
seregird	sergir, sermezin
serehusk/sarehusk / serewîşk/serewuşk	serhişk
sergovend	sergovend
serkewte/serkewtî	serkevî/serkeftî/serketî
serpale	serpale
<b>sernewe</b>	sersal, [sala nû]
verdest	berdest
verroj/verroc	berroj

### C.2. Bêjeyên hevedudanî yên ku li gor cihguhertina bêjeyên îzafeyê hatine çêkirin.

Bo nimûne, em li ser îzafeya "cinîya xalî" (KU. jina xalî) bifikirin. Di vê îzafeyê de, "cinî" (KU. "jin") bêjeya yekem, "xal" bêjeya duyem e. Di bêjeya hevedudanî ya "**xalcinî**" (KU. "**xalojin**")ê de, ev her du bêje li gor rêza îzafeyê nehatine ba hev, bêjeya yekem (KI. "cinî", KU. "jin") û duyem ("xal") cihê xwe bi hev guhertine. Ango, bêjeya yekem ya îzafeyê, di vê bêjeya hevedudanî de bûye duyem, bêjeya duyem ya îzafeyê jî bûye yekem (KI. "xal + cinî", KU. xal + o + jin"). Bi vî awayî bêjeya hevedudanîya "xalcinî" (KU. "xalojin") çêbûye.

Hin nimûneyên din:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
aşxane	aşxane
biracinî/biracenî	birajin
<b>birakêna/birakeyna</b>	birazî/biraza
biraza / birarza (n)	biraza/birarza/birazî/birarzî (m, n)
birazaye (m)	birazî/biraza (m, n)
<b>bîro [bînroj]/bêro/bîyor</b>	roja din/roja dî
<b>datcinî/dedcinî</b>	amojin/jinam, jinap, jinmam
<b>datîza/deza/dereza</b>	pîmam/pîzîmam, kurmam/kurap/kuram
<b>datkêna/detkêna/dedkêna/datkeyna</b>	dotmam, keçap, qîzap, keçmam, keçam
destarî/destar/distarî/distar	destar
destere	destere
emcinî	amojin, jinam, jinap, jinmam
<b>emiza</b>	kurmet, pîsmet
<b>emkêna</b>	keçmet/keçmetik/kiçmet, dotmet, qîzmet
<b>fekgem</b>	bîzmik
kopekbav/e	kopekbav
kopekza/kopekzay	<b>kurê kûçikî</b>
korocax/kuarwicax	korocax
kutîkbav	kûçîkbav



kutikzay	<b>kurê kûçikî</b>
nacînî/ <b>najînî</b> / <b>nacnî</b>	amojin/amojn/amoj, <b>jinap</b> , jinmam, jinam
piştwerdî/piştwer/pişwerde/pişwerdi/pişwerd/pişwêr/pişêrd/pişyerd/pişortî/pişotî	<b>bermayî, avrû/avrî</b>
paşmêr	piştêmêr
pîrbab/pîrbav	bapîr
pîzebend	<b>navteng</b>
sipîdare/sipêdar	sipîndar/spîndar/spindar
solawe	sûravk, <b>şoravk</b>
sûrgule/sûrgul/suirguil/surguli/surgul	sorgul
şewlete/şewelete/sewelete	nîveşev/nîvşev
tîremar/tîrmar/tîremor	tîremar
<b>verbendik</b>	bervank
<b>vewrgude</b>	<b>berfegulok</b>
<b>vewribe</b>	berfedims/berfedimsk, berfemot
voregude: bnr. vewrgude	
vorgud: bnr. vewrgude	
vorguid: bnr. vewrgude	
warkêna (m)	xwarzî/xwarza (m)
<b>warpay/warbay/warway</b> [payo viran]	[xwerû pê], pêxas, pêxwas
xalcinî	xalojin
<b>xalekêna</b>	keçxaltî/keçxalet/keçxaltîk/keçxatî/kiçxalet, dotxaltî
xaleza	kurxaltî/kurxale/kurxalet/kurxaltîk/kurxatî, pisxaltî
xalîza/xalza	kurxal, pisxal
<b>xalkêna</b>	keçxal, dotxal
xoşawe/xoşab/xueşaw/xoşawî/xosawî	xoşav/xweşab/xweşav
<b>yaykeza/yaykiza/yaykza</b>	kurxaltî/kurxale/kurxalet/kurxaltîk/kurxatî, pisxaltî
<b>yaykêna</b>	keçxaltî/keçxalet/keçxaltîk/keçxatî/kiçxalet, dotxaltî
<b>zirkêna</b>	zirkeç, <b>keçhilî</b>

### C.3. Bêjeyên hevedudanî yên ku bi dubarekirina bêjeyekê hatine çêkirin.

Hem di kirmanckî de hem jî di kurmanckî de, hin bêje dubare dibin û paşgira "-ik"/"-ike"/"-iki", "-o", "-ok", "-oke", "-kî" li wan zêde dibe, dibin bêjeya hevedudanî.

Bo nimûne: xal + xal + ok → xalxalok (KI., KU.).

Çend nimûneyên din:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmanckî</b>
hehecike/hachaciki/hejhejiki	hehecîk/hehecik/hehecok/hedhedik/xecxecok
peypeykî	paşpaşkî
qumqumike/qumqumik/kumkomok / gumgumiki	qumqumok/qimqimok/gumgumok/gimgimok / gumgimok
<b>xalxalo/xalxalîkî</b>	heftok, pêncok
xalxalok	xalxalok (kêzika bi rengê sorv xalên reş)
xapxapik	xapxapok

### C.4. Ji bo çêkirina hin bêjeyên hevedudanî, bêjeyek dubare dibe û navgirê "-a-", "-an-" yan jî "-e-" yê dikeve navbera wan; her sê bi hev re bêjeya hevedudanî pêk tînin.

Bo nimûne:

germ + a + germ → germagerm (KI.)

germ + e + germ → germegerm (KU.)

Hin nimûneyên din:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
davadêv / devdev	devadev/devedevî/devdev
dergaderg	<b>bi direjayî</b>
fekafek	devadev/devedevî/devdev
giregir	giregir
lezalez/lezeleze	lezalez/lezelez, <b>zû bi zû, zû zû</b>
nêmanê/mîmanîm, nîmonîm	nîvenîv, nîvonîvo
rasterast/raşteraş/raştaraş	rasterast
rewarew	<b>zû zû, zû bi zû</b>
seraser/seranser	seraser/sereser/seranser

**C.5.Bêjeyên hevedudanî yên ku bi du bêjeyên dijawate hatine çêkirin.**

Hem di kirmanckî de hem jî di kurmancî de, hin bêjeyên hevedudanî hene ku ji du bêjeyên dijawate hatine çêkirin.

Nimûne:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
çepraz/çapraz	çepraz/çeperast/çeprast
serdgerm	sarger/saregerm/sarogerm

**C.6.Ji bo çêkirina hin bêjeyên hevedudanî, du bêjeyên dijawate tên rexê hev û navgira "-a-" yan jî "-e-"yê dikeve navbera wan, her sê bi hev re bêjeya hevedudanî pêk tînin.**

Nimûne:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
cêracor/cêrecor/coracêr	ji jêr heta jor, hemû, jorejêr
verapey/verapê	berepaş

**C.7.Bêjeyên hevedudanî yên ku bi alîkarîya gîhaneka "û"yê hatine çêkirin.**

Du bêje tên rexê hev û gîhaneka "û"yê dikeve navbera wan, her sê bi hev re bêjeya hevedudanî pêk tînin.

Nimûne:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
fekûrû / feknur	devûrû / deverû
tîmûtîm	tîmûtîm

**C.8.Bêjeyên hevedudanî yên ku tenê ji du bêjeyên xwerû hatine çêkirin.**

Di vî beşî de, bê ku pêşgir, paşgir yan jî navgir lê zêde bibe, du bêjeyên xwerû hatine rexê hev û ji wan bêjeyeka hevedudanî çêbûye.

Hin nimûne:

<b>Kirmanckî (Zazakî)</b>	<b>Kurmancî</b>
berfek	berdevk
darnequr/darniqor	darniqar/darniklok/darniqrok
destmaj [destnimaj]/ desmaj/desmac/deşmaj	destmêj/destnimêj/desmêj
dilete/dileti, cêwî	cêwî
dilule, çifte	dulûle/dulûlik, çifte
diveng	dudeng
digoşe/digûşi/digoşi/digueş/dingûşi	duguh
çarçewa/çarçewe/ çarçiwa/çarçifa/ çarçefe/	çarçove/çarçewe/çarçeve/çarçive/çarçîve/çarçope/çarçowe/çarçîfe
çarpê	çarpê, ker, çuwarpê (KN)
çarwa/çarwe	çarpê/çavrî/çawrî çarewa (KN)/çarewê (KN)/çuwarpê (KN)
hevalcêwî/havalcêvî	hevalcêwî
paşkil/paşkul/paskul/paskule/paskîl pine	[paş + kil] pihîn/pîn/pehîn/pehn/pêhn/pên

peyser	berepaş/beropaş, paşepaş
serdest	serdest
sêpare	1. taştê/taştî/têst 2. firavîn, navroj
uca/ewca/awca/ ewza/uza	ew cî, ewder
wide/widi	wêderê

### C.9) Bêjeyên hevedudanî yên ku ji sê bêjeyan hatine çêkirin

Carina bejeya hevedudanî ji sê bêjeyan pêk tê lê bêjeyên wisa gelek kêr in.

Nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî
awdestxane/awdastxane/awdestxone/awdestxûne	avdestxane/abdestxane
destawxane	destavxane

### 3. Hevbeşî û cudahiya bêjeyên kirmanckî û kurmancî:

Ji aliyê hevbeşbûn û cudabûnê, bêjeyên kirmanckî û kurmancî sê cure ne. Li jêrê em dê li ser van cureyan rawestin:

1) Bêjeyên ku bi temamî wekî hev in.

Nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî
çele/çile	çele/çile
dest	dest
ez	ez
ga	ga
germ	germ
kund	kund
kûze/kuze	kûze/kuze
par	par
payîz	payîz
rind	rind

2) Bêjeyên ku reha wan yek e lê dengêkî yan jî çend dengên wan hatine guhertin.

Nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî
ber/berîya/berya/beyra	derî
bîn	din
her	ker
ewro/ewrû/îro/îr/êwro/êro/êri/êr/eyro/eyrû/eyrue/ eyr/oru/oyro	evro/îro/îrû emro/îmro/ewro (KN)
hîra/hera	fîre/fere/fîreh/fereh
nika/neka/eka/enika/enka/enkê/ika/inika/inikay/ inka/inkay/inkey/inkê/ikê/inkey/înkê/nikê/newke	nûke/nika/henûke/naga/naka/nako/noke/ nuka/nûka
şewe/şew/şo/sewe	şev, şew (KN)
varan	baran
vewre/werfe	befr/berf
ziwan/ziwon/ziwûn/zan/zon/zûn	ziman

3) Bêjeyên ku bi temamî ji hev cuda ne.

Nimûne:

Kirmanckî (Zazakî)	Kurmancî
çare	enî
dat/ded, ap	ap, mam
doman/domû, zak	zarok

<b>Gangîr/Gangêr</b>	Ruhstîn
<b>hewl/howl/hol</b>	baş
<b>Homa/Hûma</b>	Xwedê/Xwidê/Xweda/Xadê/Xodê/Xodî/Xuda/Xudê
<b>keye/kehe/kîye/kê/kî/çeye/çîye/çe/çê</b>	mal
<b>rew/row/ro</b>	zû, pêşwext
<b>teştare/ taştare/têştare</b>	nîvroj/nîvero/nîvro/navroj/navro
<b>xele/xeli, genim</b>	genim

Piraniya mezin ya bêjeyên kirmanckî, bejeyên cureyê yekem û duyem in. Wekî nimûne, em dê berê xwe bidin bêjeyên "Mewlidê Kirdî" (12) yê Ehmedê Xasî. Hêja ye em bibêjin ku ev berhem, berhema edebî ya yekem e ku şairêkî kirmackîxêv nivîsîye û di 1899an de li Dîyarbekirê çap bûye.

Di Mewlidê Kirdî de 1101 bêje hene. Ji wan 92 heb navdêrên taybetî ne.

Heke em navdêrên taybetî jê derxin, 1009 bêje dimînin.

Rewşa van 1009 bêjeyan wisa ye:

Bêjeyên ku di kirmanckî û kurmanckî de hevbeş in: 750 (% 75).

Bêjeyên ku reha wan yek e lê dengekî yan jî çend dengên wan hatine guhertin: 150 (% 15).

Bêjeyên ku bi temamî ji hev cuda ne: 109 (% 10.9).

Wekî ku em dibînin, li gor bêjeyên vê kitêbê, **rêjeya bêjeyên ku di kurmanckî de bi temamî cuda ne % 10.9 e.**

Ji ber ku ev berhem berhema yekem ya kirmanckî ye, me wekî nimûne wergirt. Bêguman ev rêjeya bêjeyan ya jorîn, ji bo hemî kitêbên kirmanckî derbas nabe. Digel vê jî hizrekê dide me.

#### 4. Encam

- 1- Ji bilî Kurdên Kirmackî axêv ku li dervey Kurdistanê dijîn, îro li gorey jêderan kêma zêde li (12) wîlayetên bakûrê Kurdistanê xelkê Kirmanckê axêv heye.
- 2- Li gor pêkhatinê di Kirmanckîyê de sê cur bêje hene: bêjeyên xwerû, darştî û hevdudanî.
- 3- Di Kirmanckîyê de li gor herêman awayê pêkhatina bêjeyan ne wek heve û guhertinên dengî bi serda dihên û ev çende ne bi tenê bêjeyan vedigirî, belku derbaz dibîte sinurê pêşgir û paşgir jî.
- 4- Li gor lêkolîna hatîye kirin, di Kirmanckîyê de hejmara pêşgiran pitire ji hejmara paşgiran.
- 5- Di Kirmanckîyê de bêjeyên hevdudanî bi çend awayên cuda pêkdihên, ev çende jî li gor hindêk yasayan wek dîyalêkta

Kurmanckîyê, lê weke dîyalêkta serbexwe cudahî û taybetmendiyên xwe hene.

- 6- Piştbestin bi ew kerestê bo vê lêkolînê hatîye wergirtin, rêjeya bêjeyên hevpişk zor pitire ji rêjeya bêjeyên nîmçeciyawaz yan bi temamî ciyawaz.

#### 5. Perawêz

(1) Ji ber ku di kurmanckî de termên rêzimanî nebûne standard, ez li vir listeyeka hin termên vê gotarê li gel îngilîzîya wan dinivîsim da ku xelet neyên fêmkirin.

**bêje:** word

**dîyalekt:** dialect

**navgîr:** interfix

**pêşgir:** prefix

**paşgir:** suffix

**(2) Bêjeyên kurtkirî**

**bnr.:** binêre

**KI.:** kirmanckî (zazakî)

**KN.:** kurdiya navîn (sorani, mukri)

**KU.:** kurmanckîya bakur

**(m):** mê

**(n):** nêr

(3) 22 Ekim 1950 Genel Nüfus Sayımı, TC Başbakanlık İstatistik Genel Müdürlüğü Yayınları, İstanbul, 1961

(4) Dersimi, M. Nuri, Kürdistan Tarihinde Dersim, Heleb, 1952, r. 61

(5) Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dîmîli veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul, 1996

Bruinessen, Martin van, Ağa, Şeyh ve Devlet Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, Özgür Gelecek Yayınları, Ankara, 1991, r. 411

Xal, Mihemedî, Ferhengî Xal, berg: III, Çapxaney Kameranî, Silêmanî, 1976, r. 83, 84

Kordestanî, Hezretê Ayetullah Aqay Şeyx Muhemmed Merdûxê, Ferhengê Merdûx, Senendec, 1362 [1983], berg: II, r. 386

Mukriyanî, Gîw, Ferhengî Mehabad, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1961, r. 476

Îzoli, D. Ferheng Kurdi-Tirki, Tirki-Kurdi, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 237

Mihemedî (Şepûl), Mihemed Salih İbrahîmî, Jinawerî Zanayanî Kurd Le Cîhanî İslameti ya Gencîney Ferheng û Zanist, Çapxaneyê Meharet, Tehran, 1364/1985, r. 786-787

(6) Ce'fer, Hecî, Gotinê Mezînan li Devera Behdînan, Bexdad, 1986, r. 178-179

El-Xalidî, Zîyauddîn Başa, El-Hedîyetu'l-Hemîdiyye Fî'l-Luxetî'l-Kurdiyye, Mektebetu Lubnan, Beyrût, 1975, r. 185

Wahby, Taufiq & Edmonds, C. J. Edmonds, A Kurdish-English Dictionary, Oxford University Press, Ely House, London W. i, 1966, r. 77

Kurdo, Qanadê, Tarîxa Edebyeta Kurdî, berg: 1, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1983, r. 96

(7) Ji bo agahdarîyên zêdetir yên vê mijarê binêre: Malmîsanij, berhema navbihurî

Erdost, Muzaffer, Türkiye Üzerine Notlar, Sol Yayınları, Ankara, 1971, r. 166, 168

Beşikçi, İsmail, Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller, 3. basım, berg: I, Yurt Kitap-Yayın, Ankara, 1992, r. 191

Cihanî, Pervîz, "Kurmanç Kî ne?", Sirwe (gowarî edebî-ferhengî), Wurmê, nr. 16 (Xezelwer 1366), r. 64

(8) Bayrak, Mehmet, Kürt ve Alevi Tarihinde Horasan, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 2013, r. 190, 41

(9) "Pirsên te yên **dîşev** gelek en hişk bûn. (Te paroles d'**hier soir** étaient très dures.)" (Bedir Khan, Emir Djeladet & Lescot, Roger, Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji), Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1970, r. 213)

(10) Bêjeya "enbaz"ê hem di kurmançî de hem jî di farisî de wateya "hevpişk, pardar, şîrk"ê dide.

Bo nimûne Ehmedê Xanî, di Mem û Zînê de wisa nivîsiye:

"Enbazê fereh şerîkê xem bû

Sergeşte[y]ê xem bi navê Mem bû" (Xanî, Ehmedê, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên latînî û kurdîya xwerû: M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 230)

(11) Ji bo agahdarî û nimûneyên pirtir binêre:

Malmîsanij, "Kirmançî (Zazakî) di Suffîksî", Çira, Stockholm, Nr. 6 (1996), r. 48-63

Malmîsanij, "Kirmançî (Kirdkî) di Suffîksî", Vate, Stockholm, Nr. 1 (1997), r. 81-93

(12) Kitêba edebî ya pêşîn ya bi dîyalekta kirmançî (zazakî), mewlûda Ehmedê Xasî ye. Ev kitêb di sala 1898an de hatîye nivîsîn û 1899an de, li Dîyarbêkirê çap bûye. Xasî, di dawîya vê kitêbê de bi kirmançî wisa nivîsiye:

"Temam bi viraştîşê **Mewlidê Kirdî** bi yardimê Xalîqî û feyz û bereketê peyxamberê ma -sellallahu 'eleyhî we 'ela alihî we sellem- bi destê Ehmedê Xasî Hezanicî, di hînzar û hîr sey û şîyyes serrî de, bi tarîxê 'erebî." (Xasî, Ehmedê, Mewludê Nebî, Çapxaneyê Lîtoğrafya, Dîyarbêkir, 1899)

Kurmançîya wê:

"Temam bû çêkirina **Mewlidê Kirdî** bi alîkariya Xalîqî û feyz û bereketa pexemberê me -sellallahu 'eleyhî we 'ela alihî we sellem- bi destê Ehmedê Xasî Hezanî, di sala hezar û sê sed û şazdehan de, bi tarîxa 'erebî."

## 6. Çavkanî:

22 Ekim 1950 Genel Nüfus Sayımı, TC Başbakanlık İstatistik Genel Müdürlüğü Yayınları, İstanbul, 1961

Bayrak, Mehmet, Kürt ve Alevi Tarihinde Horasan, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 2013

Bedir Khan, Emir Djeladet & Lescot, Roger, Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji), Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1970

Beşikçi, İsmail, Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller, 3. basım, berg: I, Yurt Kitap-Yayın, Ankara, 1992

Bruinessen, Martin van, Ağa, Şeyh ve Devlet Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, Özgür Gelecek Yayınları, Ankara, 1991

Ce'fer, Hecî, Gotinê Mezînan li Devera Behdînan, Bexdad, 1986

Cihanî, Pervîz, "Kurmanç Kî ne?", Sirwe (gowarî edebî-ferhengî), Wurmê, nr. 16 (Xezelwer 1366)

Dersimî, M. Nuri, Kürdistan Tarihinde Dersim, Heleb, 1952

Erdost, Muzaffer, Türkiye Üzerine Notlar, Sol Yayınları, Ankara, 1971

İzoli, D. Ferheng Kurdi-Tırki, Tırki-Kurdi, Deng Yayınları, İstanbul, 1992

Kordestanî, Hezretê Ayetullah Aqay Şeyx Muhemmed Merdûxê, Ferhengê Merdûx, Senendec, 1362 [1983], berg: II

Kurdo, Qanadê, Tarîxa Edebyeta Kurdî, berg: 1, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1983

Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dîmlî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul, 1996

Malmîsanij, "Kirmançî (Zazakî) de Suffîksî", Çira, Stockholm, Nr. 6 (1996)

Malmîsanij, "Kirmançî (Kirdkî) de Suffîksî", Vate, Stockholm, Nr. 1 (1997)

Mihemedî (Şepûl), Mihemed Salih İbrahîmî, Jinawerî Zanayanî Kurd Le Cihanî İslametî ya Gencîney Ferheng û Zanîst, Çapxaneyê Meharet, Tehran, 1364/1985

Mukriyanî, Gîw, Ferhengî Mehabad, Çapxaney Kürdistan, Hewlêr, 1961

Wahby, Taufiq & Edmonds, C. J. Edmonds, A Kurdish-English Dictionary, Oxford University Press, Ely House, London W. I, 1966

Xal, Mihemedî, Ferhengî Xal, berg: III, Çapxaney Kameranî, Silêmanî, 1976

El-Xalidî, Zîyaeddîn Başa, El-Hedîyetu'l-Hemîdiyye Fî'l-Luxetî'l-Kurdîyye, Mektebetu Lubnan, Beyrût, 1975

Xanî, Ehmedê, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên latînî û kurdîya xwerû: M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995

Xasî, Ehmedê, Mewludê Nebî, Çapxaneyê Lîtoğrafya, Dîyarbêkir, 1899

### **Research Summary**

This Research is entitled The Birth of the Kirmanchki Words, according to the researcher who took his ideas from the both Kurdish dialects Kurmachi and Kurmanchki, in these two ways:

- 1- From the spoken resources
- 2- 2- from the written resources

The main goal of this research is to comparison between two mail Kurdish dialects, the mail part is to highlight the birth, especially to highlight the privacy of the birth of the Kurmanchki words in the terms of the structure and the common words between the Kurmanchi and Kurmanchki words, at the end some clear results were obtained.

Contents of the Research:

- 1- Introduction
  - 2- Kurmanchki words in the term of their structure
- A: Simple words  
B: Derived Words  
C: compound Words
- 1- Similarity and differences between Kurmanchki and Kurmachi words
  - 2- Results
  - 3- Margins
  - 4- Resources

Research Results:

- 1- Excluding the Kurmanchi who lives outside Kurdistan, there are about 12 million Kurmanchi speaking Kurds living in the southern part of Kurdistan.
- 2- In the term of the structure there are 3 types of the words in Kurmanchi Simple words, derived words and compound words.
- 3- In the Kurmanchi according to the region the form of the antonyms and their influence by the spoken words does not only has an effect on the words but it extends to the level of suffixes and prefixes.
- 4- In Kurmanchki I the number of prefixes is larger than the number of suffixes.
- 5- In Kurmanchki the compound words are made in different ways according the rules of Kurmanchi dialect, as an independent dialect, it has its own differences and privacies.
- 6- According to resources of the research the number of the common words is larger than the number of the semi-different or completely different words

## Tesîra Modernîzmê LI SER Xebatên Pêşî Yên FOLKLORA Kurdî Tirkî

Ramazan Pertev  
Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê, Terkey.  
(Accepted for publication: May 4, 2014)

“Folklorê herî meraqdar li welatê tirkan peyda dibe.”

Selim Sırrı Tarcan, 1922

“Her çi folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nîzing de folklorê tu mîletî ne gîhaştîye dereca folklorê me.” Celadet Bedirxan, 1941

### Kurtîya lêkolînê:

Çarçoveya vê lêkolînê, tesbîtkirina taybetmendiyên xebatên folklorê kurdî û tirkî yên pêşî ne. Wekî mêtî mebesta me ji xebatên pêşî, nivê duyemê sedsala XIX. û serê sedsala XX. e. Di vê xebatê de em dixwazin tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorê kurdî û tirkî lê bikolin û xebatên her du aliyan ên di vî warî de berawird bikin. Herwekî tê zanîn, folklorê wekî qadeke lêkolînê ya serbixwe ligel tîgînên “ziman”, “neteweyê”, “welat” û “şaristanî” ketiye rojeva rewşenbîrên osmanî. Ev hemû bi modernîzmê ve eleqedar in. Em ê jî di çarçoveya van tîgînan de di xebatên pêşî yên folklorê yên tirk û kurdan de li şopên modernîzmê bigerin û piştî jî wan berawird bikin. Lewma di vê nivîsê de, xebatên ku hatine kirin, bi piranî bi awayekî kronolojîk hatine nîrxandin.

Di vê xebatê de me xwest ku em tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorê kurdî û tirkî bikolin û xebatên her du aliyan ên di vî warî de berawird bikin. Wisa dixuye ku ji aliyê fehm û xebatên folklorê ve di navbera herdu aliyan de hevberîbîyê heye. Lewra daxwazên wek zîmanekî xerû, desthilateke neteweyî, welatekî serbixwe û şaristaniyê hemdem (Rojavayî) armancên sereke yên wê serdemê ne. Ji ber vê yekê fehm û xebat ji gelek aliyan ve dişibin hevûdu. Ji ber ku di nav Împaratoriya Osmaniyan de tirk neteweyê serdest bûn, herî gîşan haya wan ji pêşketinê Rojavayê çêdibû. Lewra mirov dikare bibêje ku modernîzm bi wasîteya rewşenbîrên tirk digîhaşt aliyê kurdan.

*Kilîla lêkolînê: Folklorê Kurdî, Folklorê Tirkî, Modernîzm.*

### Destpêk

Çarçoveya vê lêkolînê, tesbîtkirina taybetmendiyên xebatên folklorê kurdî û tirkî yên pêşî ne. Wekî mêtî mebesta me ji xebatên pêşî, nivê duyemê sedsala XIX. û serê sedsala XX. e. Di vê xebatê de em dixwazin tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorê kurdî û tirkî lê bikolin û xebatên her du aliyan ên di vî warî de berawird bikin. Herwekî tê zanîn, folklorê wekî qadeke lêkolînê ya serbixwe ligel tîgînên “ziman”, “neteweyê”, “welat” û “şaristanî” ketiye rojeva rewşenbîrên osmanî.<sup>1</sup> Ev hemû bi modernîzmê ve eleqedar in. Em ê jî di çarçoveya van tîgînan de di xebatên pêşî yên folklorê yên tirk û kurdan de li şopên modernîzmê bigerin û piştî jî wan berawird bikin. Lewma di vê nivîsê de, xebatên ku hatine kirin, bi piranî bi awayekî kronolojîk hatine nîrxandin.

Folklor, zargotin, gelnasî an zanista gelêrî, li ser dab û nêrît, bawerî, berhemên edebî û unsûrên madî yên civakê bi awayekî zanistî xebatan dike, wan dicivîne, disenifîne û dinîrxîne. Herwekî tê zanîn xebatên li ser folklorê xwediyê dîrokeke kevin in. Hîn jî serdema antîk ve kesên wekî Pausanis, Herodot, Strabon, Plutarch çavdêriyên xwe yên li ser gel û erdnîgariyên cûrbicûr nivîsîne. Di sedsala X. de gerzanên ereb Îbnu Fazlan û Ebû Dulef, di sedsala XIII. de Marco Polo, di sedsala XIV. de

jî Îbnu Batûta di seyahatnameyên xwe de der barê welatên ku lê geriyane de gelek agahiyên folklorî dane. Herwiha di sedsala XVII. de gerzanê navdar Ewliya Çelebî jî di pirtûka xwe ya bi navê Seyahatnameyê de li ser taybetiyên gelan agahiyên gelek girîng dane. Di sedsala XVII. de li Ewropayê ne sistematîk be jî xebatên li ser folklorê dest pê kirin. Piştî lêhaybûna girîngiya çanda gelêrî, komkirin û tomakirina xebatên berên folklorê jî zêde bûn. Lêkolîna folklorî ya bi awayekî zanistî di sala 1646an de ji aliyê zanyarê îngilîz Thomas Browne ve bi navê Lêkolînên li ser Xurafeyên di Nav Gel de hatiye kirin.<sup>2</sup>

Wekî zanist peydebûna folklorê di sedsala XIX. de ye. Lewra cereyana romantîzmê û tevgerên neteweyî li ser xebatên folklorê tesîreke mezin çê kirine. Zanyarê elman Johann Gottfried Herder (1744-1803) yekem jî wan kesan bû ku bal kişandîye ser tîkiliya çand û neteweyê. Li gorî Herder, berdewamiya serxwebûna neteweyan girêdayî parastina çand û berhemên gelêrî yên wê neteweyê ne. Di sala 1818an de Wilhelm Grimm û Jacob Ludwig Karl Grimm ku bi navê “Birayên Grîmm” bi navûdeng in û wek îlhama ekola romantîzma elmanî tên qebûl kirin, li ser folklorê elmanî û Ewropeyê gelek xebat kirin. Xeberoşk, efsane û menqîbeyên elmanî berhev kirin. Birayên

Grîmm bi awayekî zanistî li ser devok û awayên wan jî rawestiyan. Herçend li Elmanyayê di wateya zanista gelêrî de peyva "volkskunde" jî aliyê Friedrick Ekkard hatibe bikaranîn jî, peyva "folklor"ê yekem car jî aliyê arkeologê îngilîz William John Thoms ve hatiye bikaranîn. Nivîskar di hejmeta 22ê Tebaxa sala 1846an a kovara "Atheneium" de nivîsek daye weşandin. Wî, di vê nivîsa xwe de peyva folklorê bi kar aniyê. Piştî gotara Thoms, di vî warî de rêbazên zanistî bêtir derketin pêş û ev qad wekî "zanist" hate qebûl kirin.<sup>3</sup>

Di destpêka sedsala XX. de li Ewropayê gelek keresteyên folklorî hatin tomarkirin û kovarên folklorî hatin weşandin. Yekem komeleya folklorê ya bi navê "Folklore Society" (Komeleya Folklorê) di sala 1878an de li Îngiltereyê hat avakirin. Di zanîngehan de perwerdehiya folklorê dest pê kir. Bo nimûne di sala 1886an de di bin banê "Zanîngeha Oslo"yê de yekem kursiya folklorê hat damezirandin. Xebatên ewropeyîyan ên li ser komkirin û tomarkirina berên folklorî bala welatên din jî kişandiye û bi taybetî di dawiya sedsala XX. de van welatan jî lez dane xebatên folklorî.

### **1.Xebatên serdema pêşî yên li ser folklorê tirkî û kurdî**

Nimûneyên pêşî yên li ser berhevkarîya folklorê tirkî di sedsala XI. de Divanü Lûgat-it-Türk a Kaşgarlı Mahmut û di sedsala XVII. de Seyahatnameya Ewliya Çelebî ne.

Ev Seyahatname jî aliyê folklorê kurdî jî girîng e.<sup>4</sup> Li gorî Tosinê Reşîd kevintîrîn xebata ku li ser folklorê kurdî hatiye kirin û gihastiye roja me destnivîsarek e ku di sala 1711an de ji aliyê Mêsrop Maştos ve li Ermenîstanê hatiye nivîsîn û niha li Enstîtuya Destnivîsarên Kevin li Yerêvanê tîr parastin.<sup>5</sup> Ev destnivîsar bi elfabeya ermenî ye û tê de 115 gotinên pêşîyan ên kurdî hene.

Lê belê em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yên gelêrî berhev kirine û ew bi navê Duru'l Mecalîs wekî pexşankî nivîsîne.<sup>6</sup>

Di sedsala XVIII. de Mela Mihemed Qutib an jî bi navê xwe yê naskirî Melayê Erwasî li ser nexweşî û dermanan bi kurmancî pirtûkeke bijîşkiya gelêrî nivîsiye. Wî di vê pirtûkê de ji hekîmê latînî yê navdar Calînus jî sûd wergirtiye. Erwasî ji bilî nexweşî û dermanên

wan, li gorî baweriyên gelêrî yên wê demê hin şîret û pêşniyaz jî kirine.<sup>7</sup>

Ji aliyê berhevkarî û tomarkirinê xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) hatiye kirin. Wî di gelek beşên folklorê kurdî de berhem dane. Du pirtûkên wî yên bi navên Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye û Camiyya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî ji bo folklorê kurdî berhemên giranbuha ne. Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye, xebateke civaknasî, etnografî û folklorî ye. Ji rabûn rûniştinê heta awayên zewacê, ji baweriyên gelêrî heta navên jin û mîrên kurdan, ji taybetmendiyên cilûbergên kurdewarî heta xwarin û vexwarinan, der barê çand û civaka kurdan de agahî hatine dayîn. Camiyye Rîsale û Hikayetê Ekradiyye li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de 3 meqale û 40 çîrokên gelêrî hene.

Rewşenbîrê osmanî Abdülazîz Bey di sala 1910an de bi sernavê Adat ve Merasim-i Kadime, Tabirat ve Muamelat-ı Kavmiye-i Osmaniye berhevokek amade kiriye.<sup>8</sup> Ev xebat wekî naverok nêzî xebata Bazîdî ye.

Li gorî M.Öcal Oğuz rewşenbîrên wek Ziya Paşa û Ahmet Vefîk Paşa bi awayekî zanistî li ser folklorê sekinîne. Ziya Paşa paradîgmaya folklorê diyar kiriye, Ahmet Vefîk Paşa jî di sala 1885an de yekem car peyva "folklor"ê bi kar aniyê.<sup>9</sup> Rewşenbîrê kurd Celadet Bedirxan di vî warî de wiha nivîsiye: "folklor, zanîna zanistiya xelkê ye. Ev bêje bi eslê xwe îngilîzî ye. Lê îro ketiye hemû zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Jixwe kurdên Qefqasê beriya me ev bêje xistine zimanê xwe û kitêbek bi navê Folklorê Kurmancî belav kirine.<sup>10</sup> Wiha tê fehmkirin ku di nav kurdan de peyva "folklor"ê cara pêşî jî aliyê Heciyê Cindî û hevalên wî ve di salên 1930î de hatiye bikaranîn.

Ziya Gökalp jî bo ku disîplîna folklorê bide naskirin çend gotar li ser vê mijarê nivîsîne. Wî wek tîgîn peyva "xelqiyat"ê bi kar aniyê.<sup>11</sup> Piştî Gökalp, M. Fuad Köprülü bi sernavê "Zanisteke Nû: Xelqiyat-Folklor" nivîsek di rojnameya Îqdamê de weşandiye.<sup>12</sup> Herwekî ku tê dîtin navên "xelqiyat" û "folklor"ê bi hev re bi kar anîne. Rîza Tefîk Bölükbaşı di rojnameya Peyamê de bi sernavê "Folklor-Folk Lore" gotarek nivîsiye.<sup>13</sup>

Nivîsên der barê folklorê kurdî de di dawiya sedsala XIX. û serê sedsala XX. de di weşanên



wekî rojnameya Kurdistan (Qahîre-1898-1902), Kürd Terakki ve Teavun Gazetesi (Stenbol-1909), kovarên wekî Yekbûn (1913), Rojî Kurd (1913), Hetawî Kurd (1909), Jîn (1918-20), Kurdistan (Stenbol-1919-21) de belav bûne.

## 2.Hikmet-i avam û lisan-ı avam / Zanista gelêrî û zimanê gelêrî

Ji bo avakirina hişmendiyê neteweyî, zimanê deverî wasitaya herî girîng e. Lewra rewşenbîr divê bi zimanekî ku girse jê fehm bike bangî wan bike ku ew tevli şoreşê bibin.14 Rewşenbîrê tirk Namik Kemal zimanekî sade parastiyê, lê belê zêde guh nedaye berhemên edebiyata gelêrî. Wî ziman wekî wasite dîtiye.15 Hîn di dawiya sedsala XIX. de helbestvanên wek Hacî Qadirê Koyî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepe di helbestên xwe de li ser girîngiya kurdînivîsînê sekinîne. Ji aliyê balkişandina girîngiya ziman di rojnameya Kurdistanê de “hişyarî”yek heye ji bo xwendevanan ku behsa eleqeya biyanîyan ên wekî elman, nemçe û îngilîzan ji bo kirîn û xwendina rojnameyê dike. Bi taybetî behsa Mösyo Martîn Hartman dike, dibêje ew li ser zimanê kurdî lêkolînan dike. Li vir tê hêvîkirin ku helwesta Hartmann ji bo lêkolîner û edebiyatvanên kurdan jî bibe mînak.16 Kurdîzade Ahmet Ramîz di sala 1906an de dema ku Mewlida kurmancî ya Melayê Bateyî çap dike, di rûpela piştê de nivîsiye ku “min niyet heye ez pirtûk û berhevokên kurdî çap bikim û biweşînim. Ji kerema xwe an ji bo xîret û namûsa qewmê xwe ez tika dikim ku pirtûkên kurdî yên li ber destên xwe ji bo ku ez çap bikim, ji min re bişînin.”17 Ji bo xurtkirina hişmendiyê neteweyî ya di warê xwedîlêderketina zimanê kurdî de, ev bangeke girîng bû.

Li Tirkiyeyê eleqeya li ser folklorê di nîvê duyemîn ê sedsala nozdemîn de dest pê kir.18 Wê demê pêwîstiyê wiha peyda bûbû ku zimanekî neteweyî ava bibe da ku piraniya gel jê fehm bike. Ahmet Mîthat Efendî li ser vê yekê wiha nivîsiye:

“Zimanê me yê edebiyatê, ne zimanekî neteweyî ye. Erebi, farisî û tirkî jî nîne. Şaheserên edebiyata me ji aliyê erebek an farisekî nayê fehmkirin. Em jî nikarin îdîa bikin ku ev edebiyat edebiyata me ye. Lewra em jî vê edebiyatê fehm nakin. Gelo bê zimanekî em dikarin bibin neteweyek? Na, lewra gelê me xwediyê zimanek e ku jê fehm dike. Hingê divê em zimanê xwe yê edebiyatê û zimanê wan cih

biguherînin, ji xeynî wî zimanî zimanekî neteweyî biafirînin.”19

Kurdiyê Bitlîsî (Yuzbaşî Emîn Beg) di nivîsa xwe ya “Kürdçeye Daîr” de, li ser têkelî û giraniya zimanê klasîk sekiniye û ji bo zimanekî hevpar û xwerû bal kişandiyê ser “axaftina gel” ku wiha nivîsiye:

“Ji hêla helbestvan û edîben kurd ve dîwan, helbest û malikên nivîsandî û hinek kitêben ku bi neesasî hatine berhevkirin jî hene. Digel ku awarteyê wê hene jî, hema hema hemûyên van dîwan û helbestan ji aliyê bikaranîna xwe ya dem û derdorê ve zimanekî têkel û xerîb e ku bi peyvên erebî û farisî tije ye û pîrr dîwan zimanê gel e ku zimanê resen ê neteweyê ye. Tevî ku destjêgerîna ji hebûna wan ne mimkûn be jî sîda ku dê ji van berhemên were girtin bisînor e.20

Di vî warî de pêşniyazên wî sîdwegirtina ji gencîneya resen a di nava gel de ye:

“Îro bi giştî qaîdeyek heye tê qebûlkirin ku zimanê xwerû yê neteweyê, zimanê girseyê ye, ne yê rewşenbîran e, bi taybetî jî ew zimanê ku pîrejin pê diaxivin. Ji ber vê yekê ez jî dixwazim ku di berhevkirina keresteyên ziman de bila usûl û peyvên awamê esas bin. Ev gencîneyê resen e...”21

Nivîskarên Tanzîmatê ji bo ku edebiyateke bi zimanê resen ê tirkî biafirînin ku bi tesîrên biyanî nehatibe têkelkirin, berê xwe dane folklor û edebiyata tirkî ya gelêrî.22 Di navbera salên 1860 û 1900î de gelek rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, romannûs di bin vê cereyanê de berhem afirandin. Şinasi di sala 1859an de yekem şanoya tirkî ya bi navê “Şair Evlenmesi” bi “lisan-i avam” (zimanê gelêrî) nivîsand. Em dibînin ku Evdîrehîm Rehmiyê Hekarî jî yekem şanoya kurdî “Memê Alan”, bi zimanekî sade nivîsiye û li ser wê îbareyê wiha daniye: “Tiyatroya kurdan fezîleta kurdan noşî didit”.

Şinasi, di sala 1863yan de Durub-u Emsal-i Osmaniye weşandiyê.23 Rewşenbîrê kurd Law Reşid (Dr. Ziya Wehbî) di kovara Jînê de bi navê “Kürdlerde Durub-ı Emsal” (Gotinên Pêşyan ên Kurdan) weşandiyê. 24

Ahmet Mîthat Efendî ji gotinên pêşyan ên ku Şinasi berhev kirine, kurteçîrok nivîsîn. Abdulhak Hamîd listikeke xwe bi gotinên pêşyan û vegotinên herêmî xemiland. Ebu Ziya Tevfik (1849-1913) li ser meddahiyê yekem car du gotarên zanistî nivîsîne.

Ziya Paşa diyar kiriye ku ziman û edebiyata tirkî ya resen, ên ku di nav gel de ne. Helbest û manzûmên me yên neteweyî hîn jî di nav ozan û gel de zindî ne. Wî bal kişandiyê ser “Aşîk Edebiyatî” û ji bo zimanekî xwerû wek çavkanî nîşan daye.<sup>25</sup>

Bi heman awayî Xelîl Xeyalî Modanî (1865-1965) jî ji bo pêşdebirina zimanê kurdî li ser girîngiya dengbêjan sekiniye. Bi gotina Jusdanis wî yekîtiya ziman û kanoneke neteweyî 26 xwestiye:

“Ji bo xwendin û nivîsandinê herfek, li ser tarzek nû elîfbayek, ji bo zanîna temamê zimanê kurdî ferhengê, îlmî halek, tarîxa bav û kalên kurdan û dab û nêrîtên wan, welatê kurdan û adet û tebê wan we mîqdar û navên eşîrên wan, kitêba hesabê, kitêba rêziman, tercemeya halê mezinên kurdan, edebiyata kurdan û navê şairên wan”, ji bo çêkirina van tiştan çiqas kitêbên kurdî heye lazim e ewan bişînin. Ji dengbêjan lawjok û çîrok û qewlêd kurdan pirs bikin û binivîsin û rê kin.”<sup>27</sup>

Di vê mijarê de Babanzade Îsmail Hakkî (1876-1913) ku di serdema pêşî ya desthilatiya Îttihad û Teraqî de wezîrê perwerdeyê bû, ji bo pêşketina kurdan behsa girîngiya zimanekî xwerû û resen ê nivîskî kiriye.<sup>28</sup>

Baban Abdulazîz di nivîseke xwe de edebiyat û helbesta kurdî ya berê rexne dike. Li gorî wî heta niha di nav edîb û helbestvanên kurdan de “huner ji bo hunerê” dihat afirandin. Lê belê ji niha pê ve dive huner ji bo gel be.<sup>29</sup>

Rewşenbîrê kurd Abdullah Cewdet (1869-1932), ji bo ku di nav zarokên kurdan de rêjeya xwendevaniyê zêdetir bibe, bikaranîna tîpên (elfabe) nû û guncavtir pêşniyaz kiriye.<sup>30</sup> Kemal Fewzî di kovara Kurdistanê de wiha nivîsiye: “Di nav me de dev ji xelkê berdî gelo çend ciwanên kurd ji Dîwana Nalî fehm dikin? Lewma îro divê em ligel hemû dijiwariyan çanda kurdî berhev bikin, bikin pirtûk û belav bikin. 31

Mehmed Mihrî ku yek ji rewşenbîrên çalak ê wê demê bû di rêzenivîsa xwe ya “Edebiyat-ı Kürdiyeden Bazı Numuneler” (Hinek Nimûne ji Edebiyata Kurdî) de, nivîsiye ku li Stenbolê gelek rewşenbîr hene ku dibêjin gelo ma edebiyata kurdî heye? An jî zimanê kurdî têra edebiyatê dike? Lewma ez ê jî ji bo bersiva van pirsan ji edebiyat û stranên gelêrî yên zaravayên kurdî, goran û kurmanc çend xezel, beyt, stran, goranî, lawje, heyranok, lawik û bêrîteyan binivîsim û wergerînim û di rûpelên kovara Jînê

de pêşkeşî xwendevanan bikim.<sup>32</sup> Di dawiya nivîsê de di bin sernavê “Kurmanc Şivesi Üzerine Avama Mahsus Istran” de straneke kurdî ya gelêrî weşandiyê. Ji nimûneyên wî diyar dibe ku li nik helbesta klasîk, wî qîmet daye berhemên gelêrî jî.

Li vir helwestên rewşenbîrên tirk û kurd ên li hember edebiyata kevin jî tam ne wekî hev in. Wek Remezan Alan jî temas kiriye, li gorî rewşenbîrên tirk di nav rewşenbîrên kurdan de li hember edebiyata klasîk helwesteke neyênî xuya nabe.<sup>33</sup> Lê belê di nav rewşenbîrên kurdan de jî daxwaza zimanekî nû û çêkirina kanoneke neteweyî heye. Modernbûn li ser rediyeya yên berê ava dibû: yê modern an xwe ji rabirdûyê qut dikir, an jî îspat dikir ku layiqê wê ye. Lê belê mîrasa klasîk ku wek utopyayeke serdemî dihat dîtin, li gorî îcaba pênaseya xwe, ne ew tişt bû ku serî li ber bihata hildan, tenê tişteki bêrîkirinê (an xwezîlêanîne?) bû.<sup>34</sup> Lewra di nivîsên rewşenbîrên wek Abdullah Cewdet, Xelîl Xeyalî, Babanzade Îsmail Hakkî, Kurdiyê Bitlîsî û Kemal Fewzî de kêma zêde daxwaza zimanekî xwerû û gelêrî heye.

### 3. Hişmendiya Welat û Neteweyê

Di dawiya sedsala XIX. de bi qasî Panslavîzm, Helenîzm û Tirkîtiyê, tevgerên neteweyên wek ermen, bulgar û sirban jî di warên çalakiyên çandî de gelek pêş ketibûn. Herwiha gelek ji van xwendingeh û komele vekiribûn. Li gorî Öztürkmen di encamê de ev hemû di nav sînorên Osmanî de dijiyan yanî bi wateya fireh ev “rewşenbîrên osmanî” bûn ku tesîr li ser hevûdu çêdikirin.<sup>35</sup> Öztürkmen qet behsa kurdan nake ku mirov dibêje qey li ser vê yekê sondxwarî ye. Dema ku em li rewşenbîrên kurdan ên wê demê dinihêrin, wan jî daxwaza belavkirina zimanê kurdî, nûkirina elfabeyê, berhevkirina keresteyên folklorî yên kurdî, amadekirina pirtûkên kurdî, avakirina xwendingehên kurdî kirine. Heta hin ji van jî pêk anîne. Helbet em baş nizanin xebatên wiha bê ka çi tesîr li ser gelê kurd kiriye. Lê belê netewetiya kurdî hem ji tevgera neteweyî ya ermenan, hem jî ji rikberiya siyasetên dewleta Osmanî û rûsan tesîr girtiye ku wan dixwest kurd û ermenan bera hev bidin. Herwiha tevgera mixalefetê ya li dijî Abdulhamîd II. jî tesîr li ser kurdan kiriye.<sup>36</sup> Fewzî, di kovara Kurdistanê de behsa hestên neteweyî dike, gelo bi lavijên neteweyî yên Xrîsto Botev neketina coş û hêcanê, Bulgaran dê karîbûna di navbera 30-35 salan de civaka xwe nû bikira.<sup>37</sup>

Lê belê piştî hilweşîna dewleta Osmanîyan û avabûna Komara Tirkiyeyê, ev hewldan û xebat jî li Stenbolê nivco mane.

#### **4. Erkeke neteweyî: Eleqeya li ser kok û dîrokê / Gazindên hevpar: Çima em nayên dîtî?**

Li gorî Abdullah Cevdet eger neteweyek ne xwedî dîrokeke nivîskî û birêkûpêk be, ew netewe herwekî qet nejiyabe. Herwiha Cevdet dipirse gelo jî bo dîroka kurdan em dikarin qîma xwe hew bi pirtûka Şerefnameyê bînin. Li gorî wî Şerefname têra vê yekê nake. Divê kurd hay jî rabirdûya xwe hebin ku bikarin dahatûya xwe jî diyar bikin. Divê em li xwe mukir werin ku pirtûkeke me ya dîrokê nîne ku şayanê vê serdemê be.<sup>38</sup>

Li gorî Köprülü, têkiliya folkorê ya bi neteweyî re tenê bi welatperweriyê girêdayî nîne. Zanyariyên folklorê jî bo rêveberên siyasî di heman demê de zanyariyê bikêrhatî ye jî. Li gorî Köprülü, dewletên mêtînger jî bo rêvebirina mêtîngehan, zana û lêkolînerên xwe dişînin wan deran. Ew, demeke dirêj di nav wan gelan de dijîn, dîrok, adet, bawerî, ziman, stran û çîrokên wan dicivînin, tomar dikin. Di vî warî de qasî zanistên din, folklor jî xizmeta wan dike. Köprülü gazindên xwe jî wiha tîne ziman: “Lê belê em wiha nakin, gelo me heta niha li bajarên herî nêzik ên Anatolyayê jî lêkolînen folklorê kirine?”<sup>39</sup>

Köprülü vê mijarê wekî erkeke neteweyî dibîne. Li gorî wî danasandina folklorê tirkî bi zanayên Rojavayî re berpirsiyariya rewşenbîrên tirk e. Xebateke bi vî awayî jî bo neteweya tirk belkî xizmeta herî mezin e.

Rewşenbîrê osmanî Selim Sırrı Tarcan di gotara xwe ya bi navê “Mürebiler Arasında Folklor” (Di nav Mirebiyan de Folklor) de lêkolînen li ser folklorê tirkî wiha teşwîq dike:

“Ey tirkê serbilind ku di dema xwe de li ser sê parzemînan hukimran bû! Ey lehengê fedakar ku navê te destan bû li Rûmelî, Asya û Anatolyayê!.. Deşt û çiya û kanî, derya û daristanên te çi qas menqîbeyên mîrxasiyê vedişêrin. Çîrok û serpêhatî, stran û reqsên te bi camêrî û fedakariyan tijî ne. Folklorê herî meraqdar a cihanê li diyarê tirkan peyde dibe. Hezar caran radimûsim destên ku ew ê wê binivîsin.”<sup>40</sup>

Kurdiyê Bitlîsî jî nêzî van ramanên Tarcan, gazindan ji kêmbûna lêkolînen li ser kurdan dike û vê erkê dixê ser milên nîşan dahatûyê:

“Kurd û Kurdistan heta niha meçhûl mane. Karakterê kurdan, rewşa siruştî ya Kurdistanê, kêmbûna wasitîyên ragihandinê bûne sedem ku herêmên ku kurdî lê desthilat e baş neyên zanîn. Hûn jî vê bawerî bikin ku destên ku dê perdeya nezaniyê ji ser kurd û Kurdistanê rakin dê ne destên biyaniyan bin. Ev şerefê dê aîde zarokên kurdan ên dahatûyê be ku ew dê bi zanistên nûjen re bêne xemilandin. Ev peywir a wan e.”<sup>41</sup>

Hîn di salên 1918yan de di hinek weşanên tirkî de înkarkirina kurdan dest pê kiriye. Ji aliyê weşanên Mühacirin Müdüriyeti (Rêveberiya Koçberan) bi navê Kürdler pirtûkek hatiye weşandin ku tê de nivîsiye koka kurdan nayê zanîn. Di kovara Jînê de Kurdiyê Bitlîsî xwestiyê bersiva wan bide.<sup>42</sup> Di nivîsa xwe ya bi navê “Efsaneya Dehak” de behsa serhildana Kawa kiriye. Bitlîsî gazindan ji lêkolîneran dike ku çî li Rojava, çî li Rojhilat li ser kurdan kêma xebat hatine kirin. Xebatên ku hatine kirin jî ne cihê baweriyê ne, kêma û şaş in, di wan de gelek xeletî hene. Di encamê de dibêje ku Kurd neteweyê Îranî ne û ewên ku li dijî Dehak serî hildane kurd in.<sup>43</sup> Di jimareyên din de jî li ser vê mijarê rawestiyaye. Bi vê yekê xwestiyê hebûna kurdan di dîrokê de bide nîşandan û eger hinek hêz bixwazin kurdan tune bikin, dê kurd berxwedaneke bihêz nîşan bidin.

Memdûh Selîm Beg jî bi nivîsa xwe ya “Roja Kawe ya Taybet-31ê Tebaxê” li ser bûyera Kawa sekiniye.<sup>44</sup> Ji bilî van nivîskaran di hejmara 25an de nivîseke bênasnav a bi navê “Der barê Kawe da Meteloka Dîrokî” weşiyaye.<sup>45</sup>

Memdûh Selîm di nivîsa xwe ya bi sernavê “Mijara Tesbîtkirina Rojên Me yên Taybet” de behsa pêdiviya rojên taybet dike, dibêje ku rojên taybet rojên coşbûnê ne. Şahî, aheng, kenînen hevpar hem mafê neteweyan e, hem erkên wan e. Di van rojan de fersenda têgehîştina hebûna xwe heye, mirov jî xemên rojane bêtir bi kesayeta bilind a neteweyî re eleqedar dibin. Ruhê neteweyî di van rojan de xuya dibe. Herwiha rexneyên rewşenbîrê ewropî li ser kêmbûn û nediyarbûna rojên taybet ên kurdan jî vediguhêzîne, divê rojên taybet ên neteweyî ên kurdan bêne diyarkirin. Divê der barê rojên taybet de hişmendiyeke xurt hebe. Divê em xwe bizanin û bi yê din jî bidin zanîn. Li gorî wî, ev yek jî bo ku em wekî neteweyekê bijîn pêwîstiyêke mîsoger e.<sup>46</sup>

Mehmet Sakîn ji Encyclopedia Britanicayê wergerek kiriye. Ev werger kurteya xala “Dîroka Kurdan” e. Li ser dîrok, bawerî, ziman û edebiyata kurdan agahiyên dide. Behsa xebatên Jaba, Samuckhea, Prym, Socîn, Ferdînad Justî dike û dibêje vana gelek çîrok û destanên kurdî berhev kirine.<sup>47</sup>

Kurdiyê Bitlîsî, di wergera ji Henrî Mathieu de li ser nijad, bawerî, dab û nêrît, binyada civakî agahiyên kurt dide.<sup>48</sup> Dîsa nivîseke wî li ser nîqaşên îranîbûna kurdan e. Li vir îtîrazên wî hene li hember îdiayên ku dibêjin kurd Samî an Tûranî ne.<sup>49</sup> Di vê peywendê de dê bê bîra me ku yewnaniyan ku di navbera “modela Antîk” û “modela Arî” de di erênayê de mabûn, piştî şikestina şerê serxwebûnê, modela Arî hîlbijartin.<sup>50</sup>

Di mijara dîroka kurdan de nivîseke balkêş, a Şîlanlızade Eyub Sabrî ye ku bi referansên berhemên lêkolînerên biyanî yê wê Henry Binder, Emilie Hamlin, Mösyo Reklos û ji pirtûka dîrokê ya “Faste de la Nation Kourde” nivîsiye ku kurd neteweyêke dîrokî û qedîm in.<sup>51</sup>

Kemal Fewzî (1891-1925), di kovara Jînê de rêzegotarek li ser çîrçîrokên kurdan nivîsiye. Di pêşkêşiya gotara xwe de Fewzî behsa tîkiliya dîrokê bi çîrçîrokan re kiriye. Di gotara wî de nêrîneke antropolojîk heye. Li gorî wî eger mirov li destan û çîrçîrokên neteweyekê binihêre mirov dê bikare hin rastiyên dîrokî yê seretayî yê wê neteweyê ronî bike. Bes ku xebat bi rê û rêbazên zanistî bin. Li vir bandora xebatên folklorê yê rojavayî eşkere ye. Li gorî wî mirov nikare qîma xwe tenê bi dîtinên dîroknasan bîne. Lewra ew dikarin di hin waran de xwedî nêrînen subjektîf bin.

Fewzî behsa taybetiyên efsaneyan dike. Li gorî wî bingeha hemû efsaneyan yek e.

“Çawa ku hin netewe ji aliyên ziman, rewşa civakî û adetên civakî de dişibin hevûdu, herwiha çîrçîrokên wan jî dişibin hevûdu. Ev jî nîşan dide ku hemû mirovatî ji heman kokê ve derketine û li ser şaxên curbicur veqetiyane. Ji ber vê yekê tu efsane tune ye ku ne melez be. Çawa ku gelek efsaneyên ereban ji efsaneyên farsî îlham girtine, di efsaneyên yewnanî yê kevin de gelek baweriyên pûç ên rojhilatê hene, ew efsaneyên ku îro di edebiyata erebî de di cihekî bilind de ne.”

Fewzî mîtolojiya kurdî bi ya cihanê berawird dike û tîkiliyên di navbera wan de dikole. Ji

aliyê berawirdkirina berhemên edebiyata gelêrî ve ev yek gelek balkêş e.

“Jixwe Tîtanên ku di xurafeyên yewnanan de hene ku rojhilatî ne, ew çî bin, Hûtên heftserî yê di çîrçîrokên kurdan de jî ew in. Em dikarin bibêjin ku xurafeyên kurdan, ji ber ku rojhilatî ne, ji yê din kevintir in û bêguman îlhama xwe jî, ji wan negirtine. Çê dibe ku di navbera wan de hin wekhevî hebin. Lê belê ne ku kurdan jî ta ji demên pêşî bi hin tiştan bawer nedikirin. Helbet Kea, Rea, Hîra, Apollon, Mînrew û Zeûsê wan jî hene. Lê belê ya girîng ev e ku divê mirov vana ji xurafeyên kurdan der bixe, têxe bin çavênîya zanistê.”<sup>52</sup>

### 5. Modelên şaristaniyê û girîngiya perwerdeyê: Tirkî û kurdî

Li gorî Ziya Gökalp “xelqiyat” ew zanist e ku li ser şaristaniya manewî lêkolînan dike ku qaydeyên wê ne nivîskî ne û tenê bi rîya devkî ji nîşekî derbasî nîşekî din dibin. Li gorî hizra wî du şaristanî hene: “şaristaniya fermî”, “şaristaniya gelêrî”. Di nav tirkan de li gorî neteweyên din di navbera van her du şaristaniyan de cudahiyeke mezin heye.

Mehmed Fuad Köprülü dema ku tîkiliya di navbera folklor û netewetiyê de rave kiriye, bi qasî çekên şer behsa girîngiya xebatên çandî jî kiriye. Li gorî wî dema ku neteweyên Balkanan, Rûmelî di navbera xwe de parve dikir, wan ne tenê bi çekan, herwiha bi belgeyên dîrokî, zimanî û însanî ve jî xwe amadeyê vê yekê kiribûn.<sup>53</sup> M. Salih Bedirxan jî di nivîseke xwe ya bi navê “Berî Şûr Qelem” de li nik şûr girîngiya pênuşê yanî perwerdeyê aniye ziman. Divê kurd tenê bi erd û şûr re girêdayî nemîne, di heman demê de dest û serên ku wan erd û şûran bi rê ve dibin li gorî vê çaxê divê xwe bi zanist û îrfanê bipêçin.<sup>54</sup>

Di beyana Komeleya Hêvî (Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti) de di vî warî de tesbîtên wiha hene:

“Em îro qenc bizanin ku di dewra ha da bi tufenk û şûr û xencer miletek najî, ber wan ‘ilm û sin’et lazim e. Îro her miletek di ‘ilm da, di sin’et da, di danûstan da, di cotyarî da bilind bûye û pêşve çûye û roj bi roj wekî birûsk diçe. Em ji bo gihana wan lazim e ku wekî berq û birûsk bixebitin bi şev û roj nesekinin.”<sup>55</sup>

Evdirehîm Rehmîyê Hekarî jî di nivîsa xwe ya “Şerê Topan Xilas Bû, Îro Şerê Qeleman e” de behsa vê mijarê dike.<sup>56</sup>

Babanzade Îsmâil Hakki behsa komeleya fransî “Alyans Fransez” û komeleya Cihûyan a “Alyans Îsrâîlît” dike û di mijara perwerdeyê de wan wekî model nîşan dide.<sup>57</sup>

Abdullah Cevdet, nivîsiye ku kurd û ermen li nik hev dijîn. Gelê ermen li gundên xwe Şekspir, Hamlet, Makbet, Jul Sezar, Qral Lîrê dixwînin. Li gundên ermenan pirtûkên kesên wek Alfîrî, Dante, Montesku, Darwîn bi zimanê ermenî tîn xwendin. Cevdet di vî warî de kurdan bêpar dibîne û rexneyan li hikûmetê digire.<sup>58</sup>

Memdûh Selîm di nivîsa xwe ya “Jinên Kurd” de behsa girîngiya rola jinan ya di civakê de dike. Di civakên medenî de jin bi rastî jî nivê civakê ne. Mafên wan jî bi qasî yê mêran in. Piştî Li ser girîngiya perwerdeya jinan disekine.<sup>59</sup>

Ew di nivîsa xwe ya bi navê “Di Kurdîtiyê de Cereyanên Pêşketinê” de jî li ser mijarên şaristaneyê çawa disekine. Li gorî wî, Kurdîtiya ku nûjenbûn li ser wê ferz e, dê ne li derveyî qaîdeyên giştî be. Kurdîti jî dema ku nûbûnê li gorî pêdiviyên şaristaniyê nepejirand (...) ew ê qurbanan bide. Selîm terciha xwe jî bi awayekî eşkere diyar dike:

“Em razên hêzên cihangiştî yê îro ku çavkaniya wan Ewrope û Amerîka ne, fehm dikin û êdî em dizanin ku cereyanên ku ji wan aliyan tîn ne bayên jehrî ne, bayên jiyane ne.”<sup>60</sup>

Li gorî Memdûh Selîm, di demê kurt de kurd miseft in ku bikarin şaristaniyê bilind bipejirînin û geşedaneke gelek xurt jî pêk bînin. Ji nivîsên van rewşenbîran jî xuyaye ku modela şaristaniyê Rojava ye.

## 6. Helwest û metodên zanistî

Herwekî tê zanîn di xebatên folklorî de yek ji aliyên rêbaza zanistî nîşandana çavkaniyan e. Mela Mehmûdê Bazîdî di serê çîroka xwe ya Mem û Zînê de navê Ehmedê Xanî bi bîr tîne û wekî çavkanî nîşan dide:

“Ji şairê di kurmancan, bi zimanê kurmancî, di tarîxa hezar û şeş sedî da di qeseba Bayezîdê da, hezretî Ehmedê Xanî kitêba ku telif kiriye bi wezn bi navê Mem û Zînê, aşiq û maşuq, li wechê muxteser beyana wan dike.”<sup>61</sup>

Bazîdî di berhema xwe ya bi navê Camiyea Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî de di rêza sî û çaran de behsa destana Dimdimê dike û dibêje Melayê Bateyî ev ji meclîsan wergirtiye û bi awayê menzûm nivîsiye. Di

dawiya çîrokê de navê Melayê Bateyî bi vî awayî bi bîr tîne:

“Êdî ji wê rojê heta niha jî Kela Dimdimê wesane xalite el-xaliye xerabe dimîne. Êdî ava nebûyî, eve qezya şerê Kela Dimdimê qewî meşhûr û me'rûf e di Kurdistanê da. Melayê Bateyî M.H. li vê qiseyê muezun dastanek îna kiriye, ekserê ekrajan wê destanê di meclîsan da dixwînin û ji boyê şehîdê Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û duayê dikin.”<sup>62</sup>

Ji aliyê mijara nîşandana çavkaniyan ve ev gelek girîng in. Lewra hem nîşaneyên hebûna tradîsyona nivîsînê ya bi zimanê kurdî ne, hem jî bêhna metodolojiyê ji wan tê.

Ibrahim Şinasi di berhema xwe ya bi navê Durub-ı Emsal-i Osmaniye de nêzî du hezar gotinên pêşyan ên tirkî berhev dike û der barê çavkanî û kesên çavkanî de agahiyan dide. Li gorî M.Öcal Oğuz ev dikare wekî yekem helwesta zanistî bê şîrovekirin.<sup>63</sup>

Ziya Gökalp ku berê li ser çand û zimanê kurdî dixebitî <sup>64</sup>, paşê berê xwe dabû kereseteyên folklorî yê tirkî û ew berhev dikirin. Çend gotarên wî der barê rêbazên berhevkirina çîrokan de hene.<sup>65</sup> Gökalp di nameyê xwe de ji Fuad Köprülü re wiha nivîsiye: Ez li vir (Diyarbakir) çîrokên gelêrî berhev dikim. Hêvî dikim ku wan di “Küçük Mecmua”yê de biweşînim. Herwiha ez ê baweriyên gelêrî jî berhev bikim. Em li Diyarbakirê stranên antîk ên gelêrî jî berhev dikin. Herwiha ez li ser eşîrên tirk, ereb û kurdan jî lêkolînên etnografîk dikim û hêvî dikim ku muzeyêke biçûk a etnografîyê ava bikim.<sup>66</sup>

Siyasetmedar û rewşenbîrê kurd Kemal Fewzî jî di rêzenivîsên xwe yê bi sernavê “Kürd Masalları” yê kovara Jînê de behsa rêbaza berhevkirina çîrokên kurdî kiriye. Fewzî behsa xetereyên jibîrkirin û windabûna efsaneyên kurdî dike û vê yekê wekî xetereyê mezin dibîne. Behsa ihtimala varyantan dike û vê yekê normal qebûl dike. Piştî jî rêbaza xwe eşkere dike: Di dema berhevkirinê de kesên çavkanî jê re çawa gotibin, ew ê jî bi wî awayî tomar bike.

“Wek her tiştên wê, wan efsaneyên rind û şîrîn ên vî neteweya bêçare jî di bin xweliya jibîrkirinê de mane. Ez tiştên ku dibihîzim, bêtî ku tiştêk ji xwe li ser zêde bikim bi wî awayî vediguhêzînim. Ne dûrî ihtimalan e ku ev efsane di demên cuda de û li deverên cuda teşe guhertibin. Heman çîrçîrok li deverêke kurdan bi

awayekî din dikare bê vegotin. Piştî ku bingeh yek bin, di hûrgiliyan de tu mehzûr nîne...” 67

Kemal Fewzî, di dewama vê de wiha nivîsiye:

“Bi qasî ku ez bizanim û bikarim, ez ê efsaneyên Kurdan di rûpelên Jînê de li ber çavên însaf û lêkolana efsanezanan daynim. Belkî di van nivîsaran da, bêînsafiya wî nankorê Diyarbekrî jî derkeve meydanê; ew nankorê ku efsaneyên Diyarbekirê ên xweş guhartine û xistine şiklê çîrokên Dede Korkut.”

Diyar e ku Fewzî rêbazeke zanistî daye ber xwe. Fewzî yekem ji wan kurdan e ku di xebatên folklorê de daxwaza şopandina rêbaza zanistiyê kiriye.

Rıza Tefvîk (Bölükbaşı) ku yek ji nivîskarên xurt ên wê serdemê bû, ji nav keresteyên folklorî ew bêtir li ser gotinên pêşiyane\* sekiniye. Lewra li gorî wî mirov bi saya gotinên pêşiyane dikare neteweyekê baştir nas bike. Hetta gotinên pêşiyane li gorî vegotinên dîrokî yê nivîskî bêtir agahî didin. 68 Li gorî Tefvîk, folklor ne tenê gotinên pêşiyane e, çîrokên gelêrî, mamik, destan û stran û listikên gelêrî jî di nav de ne.

Dema ku em li pêşgotina xebata Law Reşîd a bi sernavê “Kürdlerde Durûb-i Emsal” dinêrin, em dibînin ku wî jî tesbîten bi wî awayî kirine. 69 Wî di dawîya xebata xwe de, beşên din ên folklorê jî rêz kirine. Law Reşîd an bi navê xwe yê rastî Dr. Ziya Wehbî (1893-1960?) Xwendîngeha Bijîşkiyê (Mektebî Tibbiye) qedandî û bijîşkî kiriye. Ew birayê Kemal Fewzî bû. 70 Demeke dirêj wî sertebîbiya Nexweşxaneyê Gumuşxaneyê kiriye. Wehbî, di kovara Jînê de bi navê “Kürdlerde Durub-i Emsal” li ser gotinên pêşiyane ên kurdan rêzegotarek nivîsiye. 71 Di nivîsa xwe de behsa xebatên Aleksandr Jaba\* jî dike û li ser têkiliya wî ya bi Mela Mehmûdê Bazîdî re hin agahiyan dide. Wehbî, daye zanîn ku gotinên pêşiyane, hem ji aliyê nîşandana asta pêşketina ziman, hem ji aliyê naskirina rewşa gel, xwedî qîmeteke mezin in. 72 Ew bi rêbazeke sistematîk gotinên pêşiyane ên kurdî wekî İctîmaî (Civakî), Hamasî (Mêrxasî), Edebî, Hukmî (Darazî), Mîzahî (Pêkenokî), Tarîhî (Dîrokî), Efsanewî, Ailevî (Malbatî), Ziraî-Rasadî (Çandinî-Azmûnî), Hadîsewî (Çîrokî) li gorî naveroka wan dabeş dike û digel kurdiya wan wergerên wan ên tirkî jî dide. Ziya Wehbî di dawîya vê xebatê de wiha nivîsiye:

“Me berê jî gotibû, ji tertîb û neşirkirina van gotinan meqsed ew e ku xizmeteke zanistî û xîreteke neteweyî jê hasil bibe. Herwiha ji ber ku gotinên pêşiyane xwedî naverokeke hêja ne, ew ji bo danasîna neteweya kurdan ji bo dost û biyaniyan jî bi kêr tînin.” 73

Yanî rasterast behsa rêbaza zanistî dike. Xaleke din a balkêş jî ev e ku Law Reşîd ji xeynî gotinên pêşiyane balê dikişîne ser beşên din ên folklorê wek “edebiyata kurdî, muzîka kurdî, reqsên kurdî, xeml û cilûbergên kurdî. Yanî xebatên li ser beşên din ên folklorê kurdî jî pêşniyaz kiriye.

Kurdiyê Bitlîsî di nivîsa xwe ya “Kürdler münasebetiyle” de li ser nijada kurdan û diyar kiriye ku di diyarkirina kokên neteweyekê de li gorî hinek lêkolîneran dab û nêrît, vegotinên dîrokî, nezîkahiya zaravayan, hevşibînen fîzyonomî û karakterî girîng in, li gorî hinekan jî sazîyên zindî yê wekî jiyana eşîrî û malbatî, edebiyat, fehma exlaq û aboriyê girîng in. Li gorî wî ev hemû heta radeyekê rast in, lê belê ya herî girîng ew e bê em di berçavkên xwe de xwe çawa dibînin. Bitlîsî piştî dibêje ku li gorî van esasan em li ser neteweya kurdî lêkolînan bikin. Ew behsa xurafe/efsaneyên kurdî dike û dibêje ev xurafeyên gelêrî nehatine berhevkerin:

“Wek hemû neteweyên îslamî, xurafe/efsaneyên neteweyî yê kurdan jî hene. Lê belê divê em van bikin du beş. Yê berî îslamê û yê piştî îslamê. Ji ber ku yê piştî îslamê hem di demeke kurt de ne û hem ji ber tesîra ereban, ne guncan in ku em li ser wan bisekinin. Hingê di destê me de hew yê berî îslamê dimînin. Gelo ev xurafeyên ku di nav gel de belav bûne hatine berhevkerin?” 74

Kurdiyê Bitlîsî jî bo xebatên meydanî şertên pêwîst wiha rêz kirine:

“Ji bo zanîna efsane û adetên neteweyekê, gelek şert û mercên pêwîst hene. Herêmên ku ew gel lê dijîn divê bi salan mirov lê bigere, demeke dirêj di nav wan de bimîne, hezkirina wan peyde bike da ku mirov bikare têkeve nav malbatên wan, zimanên wan baş bizane, ji bo lêkolîneke bingehîn ev şert û merc pêwîst in.”

Di nivîsê de ew li ser karê berhevkerinê jî sekiniye û çend xal wiha diyar kirine:

“Çi exlaqî, çi derveyî exlaqê bin, divê hemû gotinên pêşiyane werin berhevkerin û nivîsîn. Çi exlaqî, çi derveyê exlaqê bin, divê hemû çîrok, çîrçîrok û xurafeyên gelêrî bi awayên ku tînin

gotin werin berhevkerin. Mijarên wan çî dibin bila bin beyt û hemû cureyên helbestên ku di nav zimanê gel de hene, werin berhevkerin û lêkolîn..." 75

Di vê mijarê de pêşniyazeke wî ji "Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti" (Komeleya Kurd Ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan) re heye ku dibêje bila "lijneyeke ziman" were avakirin û herçi kesên ku gotinên pêşiyên ên ku nehatine qeydkirin berhev bikin û digel çîrokên wan binivîsin, bişînin û lijneyê, divê ew bi pereyekî mezin werin xelatkerin.

### 7. Xebatên folklorê yê dezgehî

Muzeya yekem a Osmanî di sala 1846an de li Stenbolê ava bû, di sala 1869an de wekî Müze-i Humayun hate binavkerin. Di muzeyê de gelek berhemên gelêrî dihatin pêşandan.<sup>76</sup> Ev sazî, yek ji tesîra modernîzmê ya Rojavayê bû li ser guherîna fehma osmaniyan. Lewra bi qewlê Anderson, muze jî û ew hêza tesewira ku muzeyan çê dike jî bi awayekî xurt siyasî ye.<sup>77</sup>

Herwekî tê zanîn di sala 1908an de rêxistina Îtîhad û Terakî bû desthilatdar. Di vê serdemê de xebatên çandî di bin banê weşan û saziyên wek "Türk Derneği" (1908), "Genç Kalemler", "Türk Yurdu Cemiyeti" (1911) û "Türk Ocakları" (1912) de dewam kir. "Türk Derneği" (Komeleya Tirk) di sala 1908yan de tê damezirandin. Vê komeleyê girîngî dida lêkolînên ser ziman, dîrok, etnografya û etnolojîya komên etnîk yê tirk. Weşana wan a bi navê "Türk Yurdu Dergisi" (Kovara Welatê Tirk) dixwest ku tirkîya osmanî xwerû û resen bike û herwiha elfabeyê jî bi tîpên nû biguherîne. Herwiha komeleyê şaxên xwe teşwîq dikir ku stranên gelêrî, gotinên pêşiyên, çîrokên gelêrî berhev bikin, der barê dîroka malbatên mezin ên tirkî de lêkolînan bikin, li ser derman û bijîşkiya gelêrî xebatên meydanî bikin.

Di sala 1912yan de "Türk Ocakları" (Oxaxên Tirk), bêtir bi aliyê xwe yê nijadperestîya tundrew li pêş bû. Di bernameya xebatê ya vê saziyê de berhevkerina dab û nêrîtan, komkirina çîrok, gotinên pêşiyên, stranên gelêrî, lêkolîna zaravayên cuda, şayesandina reqsên deverî û lêkolîna der barê mezheb û komên koçeran de dihatin teşwîqkirin. Herwiha dihat pêşniyazkirin ku her şaxek ji bo pêşangehên sinet û zenaetê bila muzeyeke "hars"ê (çand), ji bo pêşangeha keresteyên tradîsyonî û navgînên çandiniyê muzeyeke "îrk"ê (nijad) damezirîne.<sup>78</sup> Li jorê jî me nivîsîbû, berî van Ziya Gökalp jî di nav hewldana avakirina muzeyê etnografîyê de bû.

Di heman serdemê de hinek saziyên kurdan jî behsa pêwîstiya damezirandina muzeyekê kiriye. Di sala 1912an de "Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti" (Komeleya Hêvî) hatibû damezirandin. "Komeleya Hêvî" herçend di beyannameya xwe de behsa girîngiya ziman û edebiyata kurdî dike jî, ji bo komeleyê ev xal ne armancên rasterast in, an jî em dikarin bibêjin ku fehm û hişmendiya folklorê tê de zêde xuya nabin. Piştî "Hêvî"yê, "Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti" (Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan) di sala 1919an de li Stenbolê hatiye damezirandin. Komele dixwaze ku gelek xebatên çandî, civakî û perwerdeyîyê bike. Damezirînerên komeleyê di wê baweriyê de ne ku rizgarbûna neteweya kurd tenê bi xebatên siyasî ne mumkin e. Divê li gorî bingehên zanistî xebatên çandî, edebî û perwerdeyîyê jî bên kirin. Di jimareya 10an a kovara Jînê de "Belavoka Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan" hatiye weşandin. Di vê belavokê de dema ku bernameya Komeleyê ya xebatan tên eşkerekirin, li wir çend xalên girîng hene li ser rewşa folkora kurdî. Di bernameyê de li ser berhevkerin û weşandina berhemên folklor û edebiyata kurdî ya gelêrî tesbîtên balkêş hene. Girîngiya wê ew e ku cara pêşî saziyeye kurdî behsa xebatên folklorî kiriye. Di beyannameyê de xalên ku daxwaza yekîtiya ziman û kanoneke neteweyî dikin ev in:

Xal 2: Ew pirtûk û dîwan û helbestên ku hemî bêjezan û hozan û zanyarên Kurd bi zimanê Kurdî afirandine, komele dê wan bi awayekî rast û bedew bide çapkerin.

Xal 6: Komele dê kovareke gotinên pêşiyên ên Kurdî sererast bike û biweşîne; gotinên pêşiyên ên ku di zaravayên curbicur de tên gotin, ên her zaravayekî dê di kovarê da beşekî pêk bînin.

Xal 7: Komele dê haydariyên li ser adet û toreyên Kurdî yê her hêlek berhev bike; herwiha, dê çîrok û kurteçîrok û stranên gelî yê Kurdî berhev bike.

Xal 9: Ew pirtûkên ku bi zimanên Rojhilat û Rojava li ser Kurdistanê û kurdan hene, komele dê wan wergerîne û biweşîne.

Xal 10: Kurdên naskirî yê berê û niha, komele dê serpehatiyên wan binivîsîne.

Xal 19: Komele dê bixebite ku muzeyekê saz bike; ew muze dê ji tiştên şexsî û yê malan ên ku mîr û pîrekên Kurd bi kar tînin û her tewir alet û edewatên herêmî bê sazkerin. 79

Diyar dibe ku komeleyê bi fehmeke modern di bernameya xwe de cih daye xebatên folklorî û li ser giringiya wan sekiniye.

### Encam

Di vê xebatê de me xwest ku em tesîra modernîzmê ya li ser xebatên folklorî kurdî û tirkî bikolin û xebatên her du aliyan ên di vî warî de berawird bikin. Wisa dixuye ku ji aliyê fehm û xebatên folklorê ve di navbera herdu aliyan de hevterîbîyek heye. Lewra daxwazên wek zimanekî xwerû, desthilateke neteweyî, welatekî serbixwe û şaristaniyeke hemdem (Rojavayî) armancên sereke yên wê serdemê ne. Ji ber vê yekê fehm û xebat ji gelek aliyan ve dişibin hevûdu. Ji ber ku di nav Împaratoriya Osmaniyan de tirk neteweya serdest bûn, berî gişan haya wan ji pêşketinên Rojavayê çêdibû. Lewra mirov dikare bibêje ku modernîzm bi wasîteya rewşenbîrên tirk digihaşt aliyê kurdan. Ev yek jî gelekî tabîî ye. Jixwe heta serê sedsala XX. ji bo hemûyan têgîna “rewşenbîrên osmanî” dihat bikaranîn. Yanî rewşenbîrên kurd jî li ser osmaniyan dihatin hesabandin. Herwiha ji ber hewzayê çandî ya hevpar bivê nevwê tesîra xebatên tirkî li ser yên kurdî bêtir e, jixwe gelek xebatên kurdî jî bi zimanê tirkî hatine nivîsîn. Qasî ku me tesbît kiriye ku hîç tirkekî bi kurdî nenivîsiye, lê wek Memdûh Selîmbegî, Kurdiyê Bidlîsî, Kemal Fewzî, gelek kesayetên kurd bi tirkî nivîsîne.

Folklornasê tirk Dursun Yıldırım, serdemên geşedanê yên lêkolînên folklorî tirkî bi vî awayî dabeş dîke:

“Serdema Veşartî: 1839-1908; Serdema Tirkperest: 1908-1920; Serdema Sentezkar:

### Çavkanî

#### Pirtûk

1. Anderson, Benedict, *Hayali Cemaatler*, Metis, Stenbol, 1995.
2. Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.
3. Boratav, Pertev Naili, *Folklor ve Edebiyat-1*, Weşangeriya Adam, Stenbol, 1982
4. Evliya Çelebi, *Seyahatname*, (veg. Yücel Dağlı, Seyit Ali Kahraman, İbrahim Sezgin), Weşanên Yapı Kredi, Stenbol, 1999-2001.
5. Jusdanis, Gregory, *Gecikmiş Modernite ve Estetik Kültür*, Metis, Stenbol, 1998.
6. Gennep, Arnold van, *Le Folklore*, Paris, Weş. Libraire Stock, Paris, 1924.
7. Malmîsanij, *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Abdullah Cevdet*, Weş. Jîna Nû, Uppsala, 1986.

1920-1938; Serdema Kovargeriyê: 1939-1966; Serdema Zanistî: 1966 û heta îro.”<sup>80</sup>

Lê belê qonaxên geşedanê yên folklorî kurdî wiha tam ne zelal in. Bi baweriya min di dîroka lêkolînên li ser folklorî kurdî de jî divê serdemên wisa bînin ronîkirin. Ji bo vê jî li ser arşîvan xebateke sistematîk pêwîst e. Herçend di dîroka folklorî kurdî de navê herî girîng Mela Mehmûdê Bazîdî be jî ji ber ku cara pêşî di xebatên folklorê de behsa rêbazên zanistiyê kirine divê mirov cihekî taybet bide kesên wek Xelîl Xeyalî, Kurdiyê Bidlîsî (Yuzbaşî Emîn Beg), Memdûh Selîmbeg, Kemal Fewzî, Law Reşîd (Dr. Ziya Wehbî) û yên din. Wan di kovarên kurdî yên wek Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Jînê de gelek gotar nivîsîne. Ji bilî xebatên xwe yên siyasî em dibînin ku ew di warê folklor û edebiyata kurdî de jî serwest in. Lewra wan di warê tomarkirin, berhevkerin û weşandina berhemên folklorî kurdî de bikaranîna rêbazên zanistiyê pêşniyaz kirine û herwiha li ser giringiya xebatên berawirdkirinê jî sekiniye.

Wekî encam çawa ku li cihanê hişmendîya netewetiyê û xebatên folklorê bi hev re têkildar bûne, di nav xebatên tirkî û kurdan de jî heman tişt tê dîtin. Bi peydabûna fikra tirkîtiyê di nav rûpelên kovar û rojnameyan de nivîsên li ser folklorê jî zêde bûne. Herçend nivîs rasterast ne yên folklorê bin jî ji aliyê dîroka lêkolînên folklorê ve gelek girîng in.<sup>81</sup> Heman rewşê em di kovar û rojnameyên kurdî yên wê demê de jî dibînin. Ligel bilindbûna hişmendîya netewetiyê, rewşenbîrên kurd jî bêtir bala xwe dane berhemên gelêrî û hewl dane ku wan ji bo armanca hişyarkirina gel bi kar bînin.

8. -----, *Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri*, Stockholm, 1993.
9. -----, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu(1900-1920)*, Vate, Stenbol, 2010.
10. Mela Mehmûdê Bazîdî, *Camîeya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (amd. Ziya Avcı), Weşanên Lîs, Stenbol, 2010.
11. Oğuz, M. Öcal û yên din, *Türk Halk Edebiyatı El Kitabı*, Weşanên Grafiker, Ankara, 2012.
12. Öztürkmen, Arzu, *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, Weşanên İletişim, İstanbul, 2009.
13. Yıldırım, Dursun, *Türk Bitiği-Araştırma/İnceleme Yazıları*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1998.
14. Yıldırım, Kadri, *Tiba Melayê Erwasî* (Dahûrîn û Werger), weş. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Stenbol, 2013.

### Kovar, Rojname



1. Baban, Abdulazîz, "Edebiyatımız ve Ediplerimizden Bir Rica", Rojî Kurd, j.4., Stenbol, 1913.
  2. Babanzade, Îsmâil Hakki, "Kürtlerin Tealisi", Rojî Kurd, j.3, Stenbol, 1913.
  3. Başgöz, İlhan, "Türkiye'de Folklor Çalışmaları ve Milliyetçilik", (wer. Serdar Uğurlu), Turkish Studies, 6/3 Summer, Türkiye, 2011.
  4. Bedirxan, M.Salih, "Berê Şîrê Qelem", Rojî Kurd, j.3., 1913.
  5. Bozarslan, M.Emin, Jîn (1918-1919), Weş. Deng, Uppsala, 1985.
  6. Cevdet, Abdullah, "Bir Hitap", Rojî Kurd, j.1., Stenbol, 1913.
  7. -----, "İttihad Yolu", Rojî Kurd, j.2., 1913.
  8. Rojnameya Kurdistan (1898-1902), "İntibah", j.3., (amd. M.Emin Bozarslan), Weş. Deng, Swêd, 1991.
  9. Ersoy, Ruhi, "Folklor Çalışmalarının 100.Yılında 'Folklor-Milliyetçilik' İlişkisi Üzerine Bazı Düşünceler", Milli Folklor, j.99., 2013.
  10. Fewzî, Kemal, "Kürd Masalları", Kovara Jîn, j. 22., Stenbol, 1919.
  11. Gökalp, Ziya, "Usullere Dair: Halkiyat I. Masallar", Küçük Mecmua, 1922.
  12. -----, "Masalları Nasıl Toplamalı?", Halk Bilgisi Mecmuası, 1928.
  13. Hekarî, Ebdurehîm Rehmiyê, "Şerê Topan Xilas Bû, Îro Şerê Qeleman e", Jîn, j.7.
  14. Herekol Ezîzan (Celadet Bedirxan), "Klasîkên Me", Hawar, j.33., Şam, 1941.
  15. Jîn, "Kawe Hakkındaki Tarihi Fıkra", Jîn, j.25.
  16. Kovara Halka Doğru, j. 14, 1913.
  17. Kurdiyê Bitlisî, "Dehak Efsanesi", Jîn, j.1., Stenbol, 1918.
  18. -----, "Kürdler Münasebetiyle", Jîn, j.2., 1918.
  19. -----, "Kürdlere Dair", Jîn, j.13, Stenbol, 1919.
  20. -----, "Kürdçeye Dair", Jîn, j. 15., Stenbol, 1919.
  21. -----, Kürdler İrani Değil midir?, Jîn, j.18, Stenbol, 1919.
  22. Law Reşîd, "Kürdlerde Durûb-i Emsal" Jîn, j.3-4-5-7-8. Stenbol, 1918.
  23. M.X.(Xelil Xeyalî), "Ziman", Rojî Kurd, j.3, 1913.
  24. M.M. (Mehmet Mîhrî), "Edebiyat-ı Kürdiyeden Bazı Numuneler", Jîn, j.2., Stenbol, 1918
  25. Memdûh Selîmbegî, "Kürd Hanımı", Jîn, j. 14.
  26. -----, "Kürdlükte Terakki Cereyanları", Jîn, j. 17.
  27. -----, "Kawe Yewm-i Mahsusu-31 Ağustos", Jîn, j.25., 1919.
  28. -----, "Eyyam-ı Mahsusamızı Tesbit Meselesi", Jîn, j.16., 1919.
  29. Rojnameya İqdam, j.6091, 1914
  30. Rojnameya Peyam, j.20, 1914
  31. Sabri, Şilanlızade Eyüb, "Kürdler Tarihi Bir Miletir 1-2", Jîn, j.17-18.
  32. Sakin, Mehmet, "Kürd Tarihinden, Asar-ı Kadimesi", Jîn, j.11.
  33. Thoms, W.J., "Folklor", Kovara Attentum, London, 1846.
  34. Xelîl Duhokî, "Mela Mehmûdê Bazîdî" Gulîstan, j.1., Stenbol, 2002.
- ### Perawêz
1. Arzu Öztürkmen, Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik, Weşanên İletişim, İstanbul, 2009, r.19.
  2. Arnold van Gennep, Le Folklore, Paris, Weş. Libraire Stock, Paris, 1924, r.69.
  3. W.J.Thoms, "Folklor", Kovara Attentum, London, 1846.
  4. Evliya Çelebi, Seyahatname, (veg. Yücel Dağlı, Seyit Ali Kahraman, İbrahim Sezgin), Weşanên Yapı Kredi, Stenbol, 1999-2001. Seyahatname ji 10 cildan pêk tê, cildên 3, 4 û 5an bi kurdan re eleqedar in, bi taybetî di cilda 4. de der barê kurdan û Kurdistanê de agahiyên gelekî berfireh hene.
  5. Bnr. Tosinên Reşîd, pêşgotina pirtûka Folklor Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008.
  6. Bnr. Arşîva Aleksandr Jaba. Kopyeyeke arşîvê ya dijital di sala 2013yan de ji aliyê Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê ve li Petersburgê hat zêdekirin û niha li Mêrdînê ye.
  7. Ji bo agahiyên berfireh bnr. Herekol Ezîzan (Celadet Bedirxan), "Klasîkên Me", Hawar, j.33., Şam, 1941; Kadri Yıldırım, Tiba Melayê Erwasî (Dahûrîn û Werger), weş. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Stenbol, 2013.
  8. Öztürkmen, b.n., r.25. ev xebat piştê bi sernavê Osmanlı Adet, Merasim ve Tabirleri ji aliyê Prof. Dr. Kazım Arısan û Duygu Arısan ve hatiye amadekirin û di 1995an de Weşanên Tarih Vakfî ve li Stenbolê çap bûye.
  9. M.Ocal Oğuz û yê din, Türk Halk Edebiyatı El Kitabı, Weşanên Grafiker, r.22, Ankara, 2012
  10. Celadet Bedirxan, "Ferhengok", Hawar, j. 30, Şam, 1941, r. 759; berhema ku Celadet li vir behs dike, pirtûka Folklor Kurmanca ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal e. Ev pirtûk ji nû ve hatiye çapkirin, bnr: Heciyê Cindî û Emînê Evdal, Folklor Kurmanca, wer. Tosinê Reşîd, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2008.
  11. Halka Doğru, j. 14, 1913
  12. Rojnameya İqdam, j.6091, 1914
  13. Rojnameya Peyam, j.20, 1914
  14. Gregory Jusdanis, Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür, Metis, Stenbol, 1998, r.69.

15. Öztürkmen, b.n., r. 23.
16. "İntibah", Rojnameya Kurdistan (1898-1902), j.3, amd. M.Emîn Bozarslan, weşanxaneyê Deng, Swêd, 1991.
17. Malmîsanij, Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Abdullah Cevdet, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1986, r. 44.
18. Agahiyên der barê xebatên folklorê li Tirkiye de, bi piranî ji van sê berheman hatine wergirtin, M.Öcal Oğuz û yê din, Türk Halk Edebiyatı El Kitabı, Weşanên Grafiker, Ankara, 2012; Arzu Öztürkmen, Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik, Weşanên İletişim, İstanbul, 2009, İlhan Başgöz, "Türkiye'de Folklor Çalışmaları ve Milliyetçilik", (wer. Serdar Uğurlu), Turkish Studies, r.1535-1547, 6/3 Summer, Türkiye, 2011.
19. Vgz. Başgöz, b.n., r.1536.
20. Kurdiyê Bitlîsî, "Kürdçeye Dair", Kovara Jîn, j. 15., Stenbol, 1919.
21. H.g.
22. Başgöz, b.n.
23. H.b., r.23.
24. Law Reşîd, "Kürdlerde Durûb-i Emsal" Jîn, j.3-4-5-7-8. Stenbol, 1918.
25. Pertev Naili Boratav, Folklor ve Edebiyat-1, Weşangeriya Adam, Stenbol, 1982.
26. Jusdanis, h.b., r.60.
27. M.X.(Xelîl Xeyalî), "Ziman", Rojî Kurd, j.3, 1913.
28. Babanzade İsmail Hakkı, "Kürtlerin Tealisi", Rojî Kurd, j.3, Stenbol, 1913.
29. Baban Abdulazîz, "Edebiyatımız ve Ediplerimizden Bir Rica", Rojî Kurd, j.4., Stenbol, 1913.
30. Abdullah Cevdet, "Bir Hitap", Rojî Kurd, j.1., Stenbol, 1913.
31. Malmîsanij, Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri, Stockholm, 1993, r.90.
32. M.M. (Mehmet Mîhrî), "Edebiyat-ı Kürdiyeden Bazı Numuneler", Jîn, j.2., Stenbol, 1918
33. Remezan Alan, Folklor û Roman, r. 46-47, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.
34. Jusdanis, h.b., r.107.
35. Öztürkmen, b.n., r. 21.
36. Malmîsanij, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920), r.11., Vate, Stenbol, 2010.
37. Malmîsanij, Bitlisli Kemal Fevzi ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri, Stockholm, 1993, r.90.
38. A.Cevdet, h.g.
39. Vgz. Öztürkmen, h.b., r.32.
40. Vgz. Öztürkmen, b.n., r. 33.
41. Kurdiyê Bitlîsî, "Kürdler Münasebetiyle", Jîn, j.2., 1918.
42. Kurdiyê Bitlîsî, "Dehak Efsanesi", Jîn, j.1., Stenbol, 1918.
43. h.g. j.1.
44. Memdûh Selîmbeg, "Kawe Yewm-i Mahsusu-31 Ağustos", Jîn, j.25., 1919.
45. ?, "Kawe Hakkındaki Tarihi Fıkra", Jîn, j.25.
46. Memdûh Selîmbegî, "Eyyam-ı Mahsusamızı Tesbit Meselesi", Jîn, j.16., 1919.
47. Mehmet Sakin, "Kürd Tarihinden, Asar-ı Kadimesi", Jîn, j.11., Stenbol, 1919.
48. Kurdiyê Bitlîsî, "Kürdlere Dair", Jîn, j.13, Stenbol, 1919.
49. Kurdiyê Bitlîsî, Kürdler İrani Değil midir?, Jîn, j.18, Stenbol, 1919.
50. Jusdanis, h.b., r. 55.
51. Şilanlızade Eyüb Sabri, "Kürdler Tarihi Bir Miletir 1-2", Jîn, j.17-18.
52. Kemal Fewzî, "Kürd Masalları", Kovara Jîn, j. 22., Stenbol, 1919.
53. Vgz. Öztürkmen, b.n., r.31.
54. M.Salih Bedirxan, "Berê Şîrê Qelem", Rojî Kurd, j.3., 1913.
55. Hetawî Kurd, j. 4-5, r. 11-14.1, Stenbol, 1914.
56. Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî, "Şerê Topan Xilas Bû, İro Şerê Qeleman e", Jîn, j.7.
57. Babanzade İsmail Hakkı, "Kürdlerin Tealisi", Rojî Kurd, j.3., 1913.
58. Cevdet, "İttihad Yolu", Rojî Kurd, j.2., 1913.
59. Memdûh Selîmbegî, "Kürd Hanımı", Jîn, j. 14.
60. Memdûh Selîmbegî, "Kürdlükte Terakki Cereyanları", Jîn, j. 17.
61. Xelîl Duhokî, "Mela Mehmûdê Bazîdî" Gulîstan, j.1., 2002, r.73-84.
62. Mela Mehmûdê Bazîdî, Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, amd. Ziya Avcı, Weşanên Lîs, Stenbol, 2010, r.117.
63. M.Öcal Oğuz, b.n., r.17.
64. Di vî warî de nivîseke Kemal Fewzî heye ku rexneyên tund lê digre û ew bi tirkîkirina çîrokên kurdî sûcdar dîke. Li gorî Fewzî, Gokalp çîrokên kurdî wek çîrokên Dede Korkut ên tirkî nişan dide. Bnr. Kemal Fewzî, "Kürd Masalları", Jîn, 1919.
65. "Usullere Dair: Halkiyat I. Masallar", Küçük Mecmuası, 1922; "Masalları Nasıl Toplamalı?", Halk Bilgisi Mecmuası, 1928.
66. Vgz. İlhan Başgöz, h.g., r.1539.
67. Kemal Fewzî, "Kürd Masalları", Kovara Jîn, j. 22-23-24, Stenbol, 1918  
\* Peyva "folklor"ê bi osmanî "hikmet-î avam" e ku di çanda osmaniyan de di wateya "durub-i emsal" yanî gotinên pêşîyan de dihat bikaranîn.
68. Vgz. Öztürkmen, b.n., r.28.
69. Law Reşîd, "Kürdlerde Durûb-i Emsal" Jîn, j.3, 1918.
70. Me ev agahî ji biraziyê wî Veysi Hizal stendin.
71. Bnr. Law Reşîd, "Kürdlerde Durûb-î Emsal", Kovara Jîn, j. 3-4-5-7-8, Stenbol, 1918  
\*\*Law Reşîd navê wî wek "İskender Jaba" nivîsiye.
72. H.g., j. 3.
73. H.g., j. 8.
74. Kurdiyê Bitlîsî, "Kürdler Münasebetiyle", Jîn, j.2., Stenbol, 1918.
75. H.g.
76. Vgz. Öztürkmen, h.b., r.24

77. Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler*, Metis, Stenbol, 1995, r.198.
78. Öztürkmen, h.b., r.51.
79. M.Emin Bozarslan, *Jîn*, c.II, Swêd, 1985, r. 489.
80. Dursun Yıldırım, *Türk Bitiği-Araştırma/İnceleme Yazıları*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1998.
81. Ruhi Ersoy, “Folklor Çalışmalarının 100.Yılında ‘Folklor-Milliyetçilik’ İlişkisi Üzerine Bazı Düşünceler”, *Kovara Milli Folklor*, j.99., r.56.

### **Research Summary:**

In the research the struggle of the Kurdish and Turkish folklore is historical. By history we mean second half of 19<sup>th</sup> and 20<sup>th</sup> century. In this research we would like to emphasize the effect of the modernism on the Kurdish and Turkish folklore. As it is known the folklore is a research ground for the concept of ‘Language’, ‘nationality’, ‘homeland’, and ‘civilization’ for western Ottoman Empire educators. We are all affected by modernism. In this framework we will shed the light on the comparison between the Kurdish and Turkish folklore, this is why the work in this research has been evaluated in a chronological way. In this research we did not want to do study the effects of the modernism on both Kurdish and Turkish folklore or to evaluate their struggle in this matter. It is clear that there is a parallel understanding and struggle from both sides. That is why the demand of an original language, national authority, independent country, and western civilization is the main goal of that era. This is why understanding and struggle in many ways are opposing each other. Because in the Ottoman Empire Turkish were the dominant nationality, they were influenced by the western civilization before others. This is why we can say that the western civilization reached other by the means of the Turkish educators